



T. C

ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZİMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANİSTA ZİMAN Û ÇANDA KURDÎ

TEZA LÎSANSÂ BİLİND

CIHÊNAVÊN SERBEXO DÎ NAVBERA ZİMANÊ KURDÎ
(ŞÊWEZARÊ BEHDÎNÎ) Û ZİMANÊ TİRKÎ DA

(Vekolineka Hemberî ye)

AMADEKAR

Vehêl Cîhad ŞUKRÎ

ŞÊWİRMEND

Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ

WAN - 2019

T. C
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

TEZA LÎSANS A BİLİND

KÛRTÇE (BEHDİNİ ŞİVESİ) İLE TÛRKÇE DİLLERİNDE
BAĞIMSIZ ZAMİRLERİN KARŞILAŞTIRILMASI

(Karşılaştırmalı Bir İnceleme)

HAZIRLIYAN

Vehêl Cîhad ŞUKRÎ

DANIŞMA

Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ

VAN - 2019



T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ danışmanlığında, Vaheel Jihad Shukri SHUKRİ tarafından hazırlanan “Cihnavên Cuda Di Navbera Zimanê Kurdî û Turkî Da (Şêwezarê Behdînî û Turkî Da)” adlı bu çalışma, 20/08/2019 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman) : Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ

İmza:

ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Kemal KAYA

İmza:

ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Mazhar TUNÇ

İmza:

ÜYE :

İmza:

ÜYE :

İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylıyorum.



Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ
Enstitü Müdür Vekili

Naverok	
Naverok	i
KURTE	viii
ÖZET	ix
ABSTRACT	x
DESTPÊK	1
Nav û Nîşana Vekolînê	1
Erkê Vekolînê	1
Rêbaza Vekolînê	1
Girîngiya Vekolînê	1
Pirsiyarên Vekolînê	1
Pişkên Vekolînê	2
BEŞA YEKEM	3
1.ÇEMKÊ CÎHÊNAVÊ SERBEXO	3
1. 1. Serhildana Peyvê	3
1. 2. Ji Layê Zaravê ve	3
1. 3. Ji Layê Wateyê ve	4
1. 4. Ji Layê Pênaseyê ve	4
2. TAYBETMENDIYÊN CÎHÊNAVÊN SERBEXO	5
3. POLÊNKİRÎNACÎHÊNAVÊN SERBEXO	6
4. CÛRÊN CÎHÊNAVÊN SERBEXO DÎ ZÎMANÊ KURDÎ (BÎ ŞÊWEZARÊ BEHDÎNÎ) DA	8
4. 1 Cihênnavên Kesên Serbexo	9
4. 1. 1. Zaravê Cihênnavê Kesên Serbexo	9
4. 1. 2. Pênaseyên Cihênnavên Kesên Serbexo	9
4. 1. 3. Pêkhatina Cihênnavên Kesê Serbexo	11
4. 2. Cihênnavên Xoyî Yê Serbexo	12
4. 2. 1. Zaravê Cihênnavê Xoyî Yê Serbexo	13
4. 2. 2. Pênaseyên Cihênnavên Xoyî Yê Serbexo	13
4. 2. 3. Pêkhatina Cihênnavên Xoyî Yê Serbexo	14
4. 3. Cihênnavên Nişane Yê Serbexo	14

4. 3. 1. Zaravê Cihênavê Nişane Yê Serbexo	15
4. 3. 2. Pênaseyên Cihênavê Nişane Yê Serbexo	15
4. 3. 3. Pêkhatina Peyvên Cihênavê Nişane Yê Serbexo	16
4. 4. Cihênavên Pirsiyarî Yê Serbexo	17
4. 4. 1. Zaravê Cihênavê Pirsiyari Yê Serbexo	17
4. 4. 2. Pênaseyên Cihênavê Pirsiyari Yê Serbexo	18
4. 4. 3. Pêkhatina Peyvên Cihênavê Pirsiyari Yê Serbexo	18
4. 5. Cihênavên Ne Diyar Yê Serbexo	19
4. 5. 1. Zaravê Cihênavê Nediya Yê Serbexo	19
4. 5. 2. Pênaseyên Cihênavê Nediya Yê Serbexo	19
4. 5. 3. Pêkhatina Peyvên Cihênavê Nediya Yê Serbexo	20
4. 6. Cihênavên Lêkder Yê Serbexo	21
4. 6. 1. Zaravê Cihênavê Serbexo Yê Lêkder	21
4. 6. 2. Pênaseyên Cihênavê Serbexo Yê Lêkder	21
4. 6. 3. Pêkhatina Peyvên Cihênavê Lêkder Yê Serbexo	22
4. 7. Cihênavên Heyî Yê Serbexo	22
4. 7. 1. Zaravê Cihênavê Serbexo Yê heyî	22
4. 7. 2. Pênaseyên Cihênavê Heyî Yê Serbexo	23
4. 7. 3. Pêkhatina Peyvên Cihênavê Serbexo Yê heyî	23
5. ERKÊN CIHÊNAVÊN SERBEXO	24
5.1. Erkên Cihênavên Kesên Serbexo	24
5. 1. 1. Nihad (Kirde Tebatî)	24
5. 1. 2. Biker (Kirdeya Lebatî)	24
5. 1. 3. Berkar (Bireser)	25
5. 1. 4. Berkarên ne Rastexo (Bireser)	25
5. 1. 5. Diyarkerên Navî	25
5. 1. 6. Temamkerê Karên Bêhêz	25
5. 1. 7. Cihêgirê Biker	25
5. 2. Cihênavên Xoyî Yê Serbexo	25
5. 2. 1. Nihad (Kirde Tebatî)	25
5. 2. 2. Biker (Kirdeya Lebatî)	26
5. 2. 3. Berkar (Bireser)	26

5. 2. 4. Berkarên Ne Rastexo (Bireser)	26
5. 2. 5. Diyarkerên Navî	26
5. 2. 6. Temamkerê Karên Bêhêz	26
5. 2. 7. Cihêgirê Biker	26
5. 3. Cihênnavên Nişane Yê Serbexo	26
5. 3. 1. Nihad (Kirde Tebatî).....	26
5. 3. 2. Biker (Kirdeya Lebatî).....	27
5. 3. 3. Berkar (Bireser)	27
5. 3. 4. Berkarên Ne Rastexo (Bireser)	27
5. 3. 5. Diyarkerên Navî	27
5. 3. 6. Temamkerê Karên Bêhêz	27
5. 3. 7. Cihêgirê Biker	27
5. 4. Cihênnavên Pirsiyarî Yê Serbexo	28
5. 4. 1. Nihad (Kirde Tebatî).....	28
5. 4. 2. Biker (Kirdeya Lebatî).....	28
5. 4. 3. Berkar (Bireser)	28
5. 4. 4. Berkarên Ne Rastexo (Bireser)	28
5. 4. 5. Diyarkerên Navî	28
5. 4. 6. Temamkerê Karên Bêhêz	28
5. 4. 7. Cihêgirê Biker	29
5. 5. Cihênnavên Ne Diyar Yê Serbexo.....	29
5. 5. 1. Nihad (Kirde Tebatî).....	29
5. 5. 2. Biker (Kirdeya Lebatî).....	29
5. 5. 3. Berkar (Bireser)	29
5. 5. 4. Berkarên Ne Rastexo (Bireser).....	29
5. 5. 5. Diyarkerên Navî	29
5. 5. 6. Temamkerê Karên Bêhêz	30
5. 5. 7. Cihêgirê Biker	30
5. 6. Cihênnavên Lêkder Yê Serbexo	30
5. 7. Cihênnavên Heyî Yêserbexo	30
BEŞA DUYEM	31
1.ÇEMKÊ CIHÊNNAVÊ SERBEXO DÎ ZÎMANÊ TÏRKÎ DE	31

(TÜRK DİLİNDE ZAMİRLER ÜZERİNE GENEL BİR İNCELEME).....	31
1.1.Ji Layê Mêjûyê ve (Tarihi Açından Zamirler)	31
1.2.Ji Layê Zaravê ve (Terim Olarak Zamirler).....	31
1.3.Jı Layê Wateyê ve (Anlam Açısından Zamirler)	32
1.4.Ji Layê Pênaseyê ve (Tanımlar).....	32
2. TAYBETMENDİYÊN CİHÊNAVÊN SERBEXO Dİ ZİMANÊ TİRKÎ DE	33
(TÜRK DİLİNDE BAĞIMSIZ ZAMİRLERİN ÖZELLİKLERİ).....	33
3. POLÊNKİRİNA CİHÊNAVÊN SERBEXO Dİ ZİMANÊ TİRKÎ DE.....	34
(TURK DİLİNDE (BAĞIMSIZ ZAMİRLERİN SINIFLANDIRILMASI)	34
4. CÛRÊN CİHÊNAVÊN SERBEXO Dİ ZİMANÊ TİRKÎ DE (TURK DİLİNDE BAĞIMSIZ ZAMİRLERİN ÇEŞİTLERİ)	36
4.1.Cihênavên Kesên Serbexo Di Zimanê Tirkî De	37
(Turk Dilinde Debağimsız Şahıs Zamirleri)	37
4. 1. Cihênavên Kesan (Şahıs Zamirleri).....	37
4. 1. 1. Jı Layê Zaravî ve (Terim Olarak Kişi Zamirleri).....	37
4.1.2. Jı Layên Pênaseyan ve (Tanım Açısından Kişi Zamirleri).....	37
4.1.3.Jı Layên Pêkhatinê va (Yapıları Bakımından Dönüşlülük Zamirleri)	38
4.2. Cihênavênxoyî Yên Serbexo Di Zimanê Tirkîde.....	40
(Turk Dilinde Bağımsız Dönüşlülük Zamirleri)	40
4.2.1.Jı Layê Zaravî ve (Terim Olarak Dönüşlülük Zamirleri).....	40
4.2.2.Pênaseyên Cihênavên Serbexo Yên Xoyî.....	40
(Turk Dilinde Dönüşlülük Zamirleri Hakkında Yapılan Bazı Tanımlar)	40
4.2.3. Ji Layê Pêkhatinê va (Yapıları Bakımından Dönüşlülük Zamirleri)	41
4.3.Cihênavên Nişane Yên Serbexo	42
(Turk Dilinde Bağımsız İşaret Zamirleri)	42
4.3.1.Ji Layê Zaravê ve Cihênavên Nişane.....	42
(Terim Olarak İşaret Zamirleri).....	42
4.3.2.Ji Layê Pênaseyan ve Cihênavên Nişane	42
(Tanım Açısından İşaret Zamirleri)	42
4.3.3.Jı Layê Pêkhatinê ve Cihênavên Nişane	44

(Yapısal Açıdan İşaret Zamirleri).....	44
4.4.Cihênavên Pirsiyarî Yên Serbexo	45
(Türk Dilinde Soru Zamirleri).....	45
4.4.1.Jı Layê Zaravî vecihênavên Pirsiyarî	45
(Terim Olarak Soru Zamiri).....	45
4.4.2.Jı Layê Pênaseyê ve Cihênavê Pirsiyarî.....	46
(Tanım Olarak Soru Zamirleri).....	46
4.4.3.Jı Layê Pêkhatinê ve Cihênavên Pirsiyarî	47
(Yapısal Açıdan Soru Zamirleri).....	47
4.5.Cihênavên Ne Diyar Yê Serbexo Di Zimanê Tirkî De	48
(Turk Dilinde Belgisiz Zamirler).....	48
4.5.1.Jı Layê Zaravî ve.....	49
(Terim Açısından Belgisiz Zamirler)	49
4.5.2.Jı Layê Pênaseyê ve Cihênavên Nediya.....	49
(Tanım Açısından Belgisiz Zamirler).....	49
4.5.3.Jı Layê Pêkhatinê ve Cihênavên Nediya	50
(Yapısal Olarak Belgisiz Zamirler).....	50
5.ERKÊN CİHÊNAVÊN SERBEXO DÎ ZİMANÊ TİRKÎ DE (TURK DİLİNDE GÖREVLERİ	
AÇISINDAN ZAMİRLER)	53
5.1.Erkên Cihênavên Kesên Serbexo.....	53
(Görevleri Açısından Kişi Zamirleri)	53
5.1.1.Biker (Özne).....	53
5.1.2.Nesne (Berkar)	54
5. 1. 3. Tumleç (Berkarê Nerastexo).....	54
5.1.4.Zarf (Hevalkar)	54
5.1. 5.Yüklem (Temamkerê Karî)	54
5.2.Erkên Cihênavên Xoyî Serbexo.....	54
(Görevleri Açısından Dönüşlülük Zamirleri)	54
5.2.1.Biker (Özne):.....	54
5.2.2. Nesne (Berkar)	54
5.2.3.Tumleç (Berkarê Nerastexo)	55
5.2.4.Zarf (Hevalkar)	55

5.2.5.Yüklem (Temamkerê Karî).....	55
5.3.Erkên Cihênnavên Nişane Serbexo.....	55
(Görevleri Açısından İşaret Zamirleri)	55
5.3.1.Biker (Özne):.....	55
5.3.2.Nesne (Berkar)	55
5.3.3.Tumleç (Berkarê Nerastexo)	55
5.3.4. Zarf (Hevalkar)	56
5.3.5.Yüklem (Temamkerê Karî).....	56
5.4.Erkên Cihênnavên Pırs Serbexo	56
(Görevleri Açısından Soru Zamirleri).....	56
5.4.1.Biker (Özne):.....	56
5.4.2.Nesne (Berkar)	56
5.4.3.Tumleç (Berkarê Nerastexo)	56
5.4.4.Zarf (Hevalkar)	57
5.4.5.Yüklem (Temamkerê Karî).....	57
5.5.Erkên Cihênnavên Nediyaer Ên Serbexo	57
(Görevleri Açısından Belgisiz Zamirleri)	57
5.5.1.Biker (Özne):.....	57
5.5.2.Nesne (Berkar)	57
5.5.3.Tumleç (Berkarê Nerastexo)	57
5.5.4.Zarf (Hevalkar)	57
5.5.5.Yüklem (Temamkerê Karî).....	58
BEŞA SÊYÊ	59
1.SERHILDANA PEYVÊ	59
1.1.Wekheviyên Serhıldana Peyvê.....	59
1.2.Cudahiyên Serhıldana Peyvê.....	59
2.JI LAYÊ WATEYÊ VE	59
2.1.Wekhevî Ji Layê Wateyê ve.....	59
2.2.Cudahî Ji Layê Wateyê ve	59
3.JI LAYÊ TAYBETMENDİYÊ VE.....	59
3.1.Wekhevî Ji Laye Taybetmerdıya ve	59
3.2.Cudahî Ji Laye Taybetmerdıya ve.....	60

4.JI LAYÊ POLÎNKIRINÊ VE.....	60
4.1.Wekhevî Ji Layê Polînkirinê ve	60
4.2.Cudahî Ji Layê Polînkirinê ve	60
5.JI LEYÊ CUREYAN VE	61
5.1.Wekhevî Ji Layê Cureyan ve	61
5.2.Cudahî Ji Layê Cureyan ve	61
6.JI LAYÊ ZARAVÊ VE	63
6.1.Wekhevî Ji Layê Zaravê ve	63
6.2.Cudahî Ji Layê Zaravê ve.....	64
7.JI LAYÊ PÊNASEYAN VE	64
7.1.Wekhevî Ji Layê Pênaseyan ve	64
7.2.Cudahî Ji Layê Pênaseyan ve	65
8.JI LAYÊ PÊKHATINÊ VE	68
8.1.Wekhevî Ji Layê Pêkhatinê ve	68
8.2.Cudahî Ji Layê Pêkhatinê ve	69
9.JI LAYÊ ERKAN VE.....	72
9.1.Wekhevî Ji Layê Erkan ve.....	72
9.2.Cudahî Ji Layê Erkan ve	72
ENCAM.....	73
ÇAVKANÎ	75

KURTE

Êk ji wan taybetmendiye herî girîng ku mirovan ji giyanderên dî cude diktin axaftine. Lewma gotinekî ya heyî dibêjît “her zimanek mirovek e.” armanca vê vekolîne berhevistina cihênave serbexo ye di navbera zimanê tirkî û zimanê kurdî bi şewezarê Behdîni. Bo diyarkirina wan xalên wekhev û jêk cuda. Lewma ev vekolîne hatiye bi navkirin “cihênavê serbexo di navbera zimanê kurdî-şewezarê behdîni û zimanê tirkî da.” Ev vekolîne ji bilî naverok û kurte û pêşekî û enceme û çavkaniya ji sê pişkên dî pêk dihêtin. Pişka êkê yê terxankiriye bo cihênave serbexo di zimanê kurdî da ku ew tewere tê da hatine diyarkirin. “Çemkê cihênavê serbexo û taybetmendiye wê û polînkirina wê û curên wê û erkên wê yê rêzimanî.” Her wesa pişka duyê ya terxankiriye bo cihênave serbexo yê zimanê tirkî. Ku ew jî van teweran bi xo ve digirîtin. “Çemkê cihênavê serbexo û taybetmendiye wê û polînkirina wê û curên wê û erkên wê yê rêzimanî.” Her wesa pişka sêyê yê terxankiriye bo hemberkirina pişka êkê û duyê. Ya vê namê. Û ew xalên wekhev û ji êk cuda di navbera wan da hatine ber çav kirin.

ÖZET

İnsanları hayvanlardan ayıran en önemli özelliklerinden biri konuşmaktır. “Her lisan bir insan” diye bir söz vardır. Bu çalışmanın amacı Türkçe ve Behdînan Kürtçesinde bağımsız zamirlerin karşılaştırılması, fark ve benzerliklerinin gösterilmesidir. Çalışmanın ismi de buradan gelmektedir. “Türkçe ve Behdînan Kürtçesinde ki bağımsız zamirler” Bu çalışma, içindekiler, özet, sonuç ve kaynakça bölümlerinin dışında üç bölümden oluşmaktadır. Birinci bölüm Behdînan Kürtçesindeki zamirlerin tespit edilmesi tavrıyla yazılmıştır. “Zamirlerin kavramsal açıklaması, özellikleri, sınıflandırılması, türleri ve dilbilimsel görevleri.” Aynı şekilde ikinci bölüm de Türkçe dilindeki bağımsız zamirlerin tespit edilmesi ve açıklanmasına ayrılmıştır. Aynı tavır bu bölümde de devam etmektedir. “Zamirlerin kavramsal açıklaması, özellikleri, sınıflandırılması, türleri ve dilbilimsel görevleri.” Üçüncü bölümde ise bu iki dildeki bağımsız zamirlerin karşılaştırılmasına çalışılmıştır. Bu tezin amacı olan çalışma iki dildeki benzer ve farklı noktaların tespit edilmesi ve karşılaştırılması, bu bölümde gerçekleştirilmiş ve gösterilmiştir.

ABSTRACT

One of the most important features that distinguish humans from animals is talking. “Every language is human. The aim of this study is to compare independent pronouns in Turkish and Behdînan Kurdish and to show their differences and similarities. The name of the study comes from here. Independent pronouns in Turkish and Behdînan Kurdish ”This study consists of three chapters with the exception of the contents, abstract, conclusions and bibliography sections. The first part is written with the attitude of identifying pronouns in Behdînan Kurdish. Second Conceptual explanation, properties, classification, types and linguistic tasks of pronouns. ”The second part is devoted to the identification and explanation of independent pronouns in Turkish language. The same attitude continues in this section. Conceptual explanation, properties, classification, types and linguistic tasks of pronouns. ”In the third chapter, comparison of independent pronouns in these two languages is tried. The aim of this thesis is to identify and compare similar and different points in the two languages.

DESTPÊK

Nav û Nîşana Vekolînê

Ev vekolîne bin av û nişane “Cihênavê serbexo di navbera zimanê kurdî şêwezarê behdîni û zimanê tirkî de” ku vekolîneka hemberkirinê ye. Ku tê da hewl hatiye dan behsê layenên hevpişk û cuda yên cihênavên serbexo navbera şêwezarê behrdîni yê zimanê kurdî û zimanê tirkî da bêhne diyar kirin.

Erkê Vekolînê

Keristê vekolînê birîtiye ji wergirtina numaneyan ji jêder û axaftina xelkî bi vî rengî li xarê.

- a. Numuneyên govera Behdiniyan yên zimanê kurdî
- b. Numuneyên zimanê tirkî.

Rêbaza Vekolînê

Ev vekolîna li dîv rêbaza hemberîye hatiye encamdan. Bo dananiyasîna cihênavên serbexo di her du zimanan da. Piştbestin li ser pertûkên kutapxana hatiye kirin bo helbijartina cihênavên serbexo.

Girîngiya Vekolînê

Girîngiya vê vekolînê di evan xalên li xarê da ye.

- a. Êkem vekolîne li ser evî biyavî. Di navbera cihênavên kurdî û tirkî da hatiye kirin.
- b. Cihênav beşekê girîngê axaftinê ye. Di axaftina me da bi şêweyekî berdewan dihête bi kar înan.

Pirsiyarên Vekolînê

Ev vekolîne hewldet bersiva van pirsiyarên li xarê bidetin.

- a. Erê di zimanê kurdî da bi “şêwezarê Behdîni” û di zimanê tirkî da gelo he-man polînkirin bo cihênavê serbexo heye?
- b. Dîsan taybetmendiyên cihênavên serbexo di her du zimanan da aye wekî êk in?
- c. Hejmara curên cihênavên cuda di her du zimanan da çendin?
- d. Erkên rêzimanî yên cihênavên her du zimanan bi çi awayî ne?

e. Erê pêkhatina cihênavên cuda di her du zimanan da wekî êk e?

Pişkên Vekolînê

Ev vekolîna ji bilî kurte, pêşekî, naverok, encam û çavkaniya ji sê pişkan pêk dihêt. Pişka yekî pêk dihêtin ji nav û nişanê “cihênavên serbexo di zimanê kurdî da bi şêwezarê Behdînî” ku behsê evan teweran diket. “Çemkê cihênavê serbexo”, “taybetmendiye cihênavê serbexo”, “polînkirina cihênavên serbexo”, “cureyên cihênavên serbexo” û “erkên cihênavê serbexo.”

Pişka duyê pêk dihêtin ji nav û nişanê “cihênavên serbexo di zimanê tirkî da” ku behsê evan teweran diket. “Çemkê cihênavê serbexo”, “taybetmendiye cihênavê serbexo”, “polînkirina cihênavên serbexo”, “cureyên cihênavên serbexo” û “erkên cihênavê serbexo.

Pişka sêyê pêk dihêtin ji nav û nişanê “hemberkirina cihênavên serbexo di zimanê kurdî da bi şêwezarê behdîni, cihênavên serbexo di zimanê tirkî da. Ku bo diyarkirina xalên wekhev û ji êk cuda di navbera van tawaran da. “ Serhildana cihênavan” , “wateya cihênavan” , “Taybetmendiye cihênavan” , “polînkirina cihênavan” , “cureyên cihênavan” , “Zaravên cihênavan” . “Pênaseyên cihênavan”, “Pêkhatiya cihênavan” û “erkên cihênavan.”

BEŞA YEKEM

1. ÇEMKÊ CÎHÊNAVÊ SERBEXO

Di vî tewerê da dê hewl deyn van mijaran berçav bikin. Mêjuya cihênawan û zarav û wateya wan û pênasayên wan.

1. 1. Serhildana Peyvê

Ya durust nabîtin eger em bejin li çerxê hevdê li demê dErkêtina êkem destûr nivîsê kurdî Elî Teremaxî destpêka cihênawê ye di zimanê kurdî de. (Xeznedar, 1971, s. 5) Çunkî demê polînkirin bi beşên axaftinê hatiye kirin bu zimanekê diyarkirî nehatiye kirin. Wate em dişên bejin mêjuya durust ya cihênawan bu çerxê pêncê û şeşe berî zayînê dizvirît. Ji berku wî serdemî êkem polînkirin bû polen axaftinê hatiye kirin ku êkî ji wan beşan cihênaw bû ye. (Sebrî & Aras Munîb, 2016, s. 9).

1. 2. Ji Layê Zaravê ve

Navlêkirina babetê cihênaw (pronon)wekî zarav dizimanê kurdî da bi giştî gelek destewaje bo hatine bikarînan. Lêji ber ku lêkolîna me ne girêdayî hemû zimanê kurdî ye. Em amajê nadeyne wan şêwazan yê ku girêdayî vekolîna me nebitin. Bi tenê di amajê dayne wan nivîseran ewên kar kirî di sînorê vekolîna me da. Helbetev nivîserên kar kirî li ser rêziman de vera Behdînan ji layê bikarînan zaravên cihênaw gelek nêzîkî êkin. Çunkî ji layê bingehê peyvê yan mebesta wateya peyvê ya her hemiyana wekî hev e. Bi tenê ji layê dengî ve cudahî heye. Ku hindek nivîseran li dawîya pîta “c” pîta “h”, hindekan pîta “î”, hindekan jî pîta “ê” bikarînaye. Ev çendejî dizivirîte ve bû derbirîna peyva “cih”. Çunkî peyva cihênaw ji du peyvên sade pêkhatiye. Ew jî peyva (cih+nav) pêkhatiye. Lê li hindek deverên Behdînan peyva “cih” hindek jî “cî”, hindek jî “cê” bikar tînin. Guhurîna van dangan çî kar tê kirine nakête ser wateya peyvê. Ji ber ku her hemî êk mebest digehînin. Ji layê zaravê curî ve di êk girtî nebûne. Wate ji zaravekê pitirbikar îmayne. Ew jî zaravên “cuda”, “serbexo” ye.

Wekî:

Şêzad Sabrî Aras Munib “**cihênawê serbexo û cuda**” bikarînaye. (Sebrî & Aras

Munîb, 2016, s. 277).

Lijnek ji wezaretê pola heftê “**cînavê serbexo**” bikarîname. (Lijneyek ji Wezaretê Perwerdehiyê , 2018, s. 78)

Nerîman Xoşnaw zaravê “**cênave serbexo**” bikarhinaye. (Xoşnaw, 2012, s. 54)

Lê dîsan zaravê cihênave serbexo durustir eji zaravê dî. Çunkî dinav pertûkên qutaxaneyan da heman peyvhatiye bikarhînan. Bu şeweyeke giştî xelkê devera Behdînan zaravê cihênave serbexo bikartînin.

1. 3. Ji Layê Wateyê ve

Êk ji taybetmendiyên herî girîng ji layê wateyê veye. Çunkî cihênave dişên mebesta wateya navê mirovan, giyaneweran û cihan helbigrin. Di nav risteyan da. Dîsan ji wan cudahiyan herî mezin ku cihênave ji beşên dî yê axaftinê cuda diket, layenê wê wateyê ye. Çunkî cihênave ne peyvên ferhengî ne. Bi tenê çî wateyê nadin. Ku di heman demê da dişên li cihê peyvên ferhengî yê watedar bigrin.

1. 4. Ji Layê Pênaseyê ve

Wekî ya diyar ew zimanvanên kurd di nav pertûkên zimanê da çendîn curên pênaseyên bu cihênava kirin. Ev çendê jî ji egerê hindê çêbuye ku çendî curên cihênavan hene. Ê her yek ji wan bi şeweyekê cuda cihênave digirin. Ê derbirîneji navê diketin. Lewma dêbinînkû her yekî Layenek yan çend layenek cihênave di pênaseyên xwe da diyar kiriye. Wekî **Bavê Nazê** dibêjit “cihênave beşek serekî ye ji yê axaftinê ye, ew keristê bin av nake. Wê nişan dike.” (Bavê, 2012, s. 77).

Dîsa **Îbrahim Remezani Zaxoyî**, dibêjit “cihênave peyveke cihênave digre, gelek curên cihênavan hene.” (Zaxoyî, 2009, s. 51). **Şêzad û Aras Monî**, dibêjtin “cihênave serbexu bi morfîmên Serbexo dihêne hejmartin. Di astê sintaksê de dişên li cihê kesekê yan navekê bihên û hemî Erkên wî werbigrin.” (Sebrî & Aras Munîb, 2016, s. 277) **Ebdilwahit Muşîr dizeyî** dibêjit “Ew morfîmanin ke amaje bu kesek deken û leberi kes becardên.” (Dizeyî, 2013, s. 69) **Nerîman xoşnaw** dibêjit, “Beşeke le beşekanî axawtin, kelecî yan cêgeyî nawî kesêk yan şitêk dêt, û becardêt wate debîte cêgirewey naw.” (Xoşnaw, 2012, s. 55).

Di pênaseya Bavê Nazê du layenê cihênava şîrove kirine. Ya yekê cihênave

girêdaye beşên axaftinê û ya duyê mabesta layena wê wateyê bikarînanê da diyar kiriye. Di pênaseya Zaxoyî da du layenê cihênavê diyar kirine. Ya yekî cihênavan dinav risteyan da ku li şûna navan digrin, û ya duyêçendîn cureyên cihênavan hene. Di pênaseya Sebrî Munît da çendîn layênê pênaseyê diyar kiriîne. Yekem layenê peyvê ye. Ku gotiye peyvên layênê cihênavan serbixûne û rolê wê dinava sîntaxê da diyar kiriye. Disa amaje daye erkên cihênavan yê rêzimanî. Muşîr dibêjît: Ew curêd peyvane ku amajê dikene navan. Di pênaseya Xoşnawî da amaje kiriye beşên axaftinê û amaje kiriye deme bikarînanê û amaje kiriye bi curên navan ku cihênavî kiriye cihgiriylê navî.

2. TAYBETMENDIYÊN CIHÊNAVÊN SERBEXO

Di zimanê kurdî de diyalekta jorîn cihênavên cuda çend taybetmendi hene. Evîn li xarê hindêk ji wan taybetmendiya ne.

1. Cihênavên Cuda komaleke girtiye, an ko jimareya wan ya destnîşankiriye û di şiyandaye bê hejmêrin. Ka çend cihênavan bi xwe ve digirin.

2. Cihênavên cuda pêk tên ji take morfîman, an ko her curekî cihênavên cuda hebît ji take morfîmekî pêktêt. Ê çî cihênav nînin ku bibine du morfîm yan zêdetir. Bo numune “kî”, “kîj”, “min”, “ez”, “tu”, “ew”... û hwd.

3. Cihênavên cuda di zimanê kurdî da bi ser curê morfîma serbixwe ne. An ko di bend nîn in. Wate ji layê form û wateyê vedi ser bixwe ne. Bo numue: cihênavê “xwe”. Ji layê formu wateyê ve serbixwe ne. Ê ev çende bo hemî curên dî yên cihênavên cuda durust in.

4. Cinênavên cuda dişêt beşdariyê di cihênavî de bikin. Ku dişên bibine sere yan diyarker. Weku cihênavên, “kî”, “min”, “ew”.... . hwd. Eger bi tenê hatin dibine girêyeka navî ku dibine sere. Lê dişên bibine diyarker jî. Wekî di van numuneyan da diyar dibîtin. (Kurê min, kurê kê...hwd.

5. Ji ber ku cihênavên cuda yi cihê navan dihê lewa dinav risteyan da dişên Erkên navan wergirin.

6. Cihênavên cuda neşên pêşgiran yan paşgiran werbigrin. An ko bi sadeyi dimînin.

7. Hemî curên cihênavên cudaxudanên amaje ne di zimanê kurdî da. An ku peyvên berciste ne. Ne peyvên ma'nevî ne.

8. Hemû curên cihênavên cida dibine nîşankarên kesî. Ku evan cihênavan wateyeka tamomijawî heye û birêka dewrûberî wateya wan diyar dibêt. Bo numune hemî kes dibine “min”, yan “ew”, yan “ki”. Lê li dîv dewrûberê dihête diyarkirin kak î ye(Şêrzad, 2019, s. 52).

3. POLÊNKÎRÎNA CÎHÊNAVÊN SERBEXO

1. **Sadiq Bahedîn Amêdî**, cihênav kirine heşt beş. (Amêdî, 1987, s. 223).

1. Cihênavê kesan
2. Cihênavê heyî
3. Cihênavê nîşankirinê
4. Cihênavê bêhêz
5. Cihênavê xoyî
6. Cihênavê pêgeh
7. Cihênavê pirsiyarî
8. Cihênavê nenas

2. **Şêrzat Sebrîû M. Aras Munîb** heşt cure cihênav diyar kirine. (Sebrî & Aras Munîb, 2016, s. 278).

1. Cihênavê kesan
2. Cihênavê heyî
3. Cihênavê amaje
4. Cihênavê nefî
5. Cihênavê xoyî
6. Cihênavê lêkdayî
7. Cihênavê pirsiyarî
8. Cihênavê nediyar

3. Bavê Nazê cihênav kiriye pênc cur. (Bavê, 2012, s. 78).

1. Cihênavê kesan
2. Cihênavê nîşankirinê
3. Cihênavê xoyî
4. Cihênavê peywendî
5. Cihênavê pirsiyarî

4. İbrahim Remezan Zaxoyî cihênav kirine neh cur(Zaxoyî, 2009, s. 52)

1. Cihênavê kesan
2. Cihênavê vegir
3. Cihênavê nîşandanê
4. Cihênavê lêkdayî
5. Cihênavê xoyî
6. Cihênavê gêhandî
7. Cihênavê pirsiyarî
8. Cihênavê nenas
9. Cihênavê kurt

5. Nerîman Xoşnaw cihênav kirine yazdeh cur. (Xoşnaw, 2012, s. 55).

1. Cihênavê kesan
2. Cihênavê heyî
3. Cihênavê nîşane
4. Cihênavê hewbeş
5. Cihênavê xoyî
6. Cihênavê Erênî
7. Cihênavê pirs
8. Cihênavê çendeyatî
9. Cihênavê diyar
10. Cihênavê nediyar

11. Cihênavê lêkdayî

6. Deham Ebdilfettah cihênav kirine heft cur:(Abdulfettah, 2006, s. 21)

1. Cihênavê kesan
2. Cihênavê peywendî(heyî)
3. Cihênavê nişandanê
4. Cihênavê bêhel
5. Cihênavê pirsiyarî
6. Cihênavê girêkî
7. Cihênavê nenas (Nebinavkirî)

Helbet di nav van pertûkên nivîser û zimanzanan da yê li serî me amaje pê kirî derbareyî behskirina cihênavî hem ji layê hejmara curan ve hem ji layê navlêkirina zaravê bu wan curan di êk bîr û bawer da nîn in. Her êkê li gorî baweriya xwe cûr û nav diyar kirine. Bê guman ev çende jî dibîte egerê peydakirina aloziyê li dev xwandekaran.

4. CÛRÊN CIHÊNAVÊN SERBEXO DÎ ZIMANÊ KURDÎ (BÎ ŞÊWEZARÊ BEHDÎNÎ) DA

Helbet destnîşankirina curên cihênavên serbexu di şêwezarê Behdînan da li gor van polînkirinê li serî karekî bi sanahî nîn e. lê wek û ya diyar li devera Behdînan pertûkên zimanê kurdî yê dibistanan ev babet e. Bu me êk la kiriye. Çunkî ew babetên hatine bikaranîn, dinav van pertûkan da ew curin yê pitiriyê van nivîseran amaje pêkiriye ew jî eve ne.

Ku ew jî dibine heft cur:

1. Cihênavên kesan
2. Cihênavên xoyî
3. Cihênavê pirsiyarî
4. Cihênavê nişane
5. Cihênavê ne diyar
6. Cihênavê lêkder
7. Cihênavê heyî

4. 1 Cihênnavên Kesên Serbexo

Weki di plansaziya vekolîna me da diyar ew tewerên dihêne lêkolînkirin di diyar in. Ew jî ji layê zaravî ve ji layê pênaseyan ve û ji layê pêkhatî ve ye.

4. 1. 1. Zaravê Cihênnavê Kesên Serbexo

Sadiq bahedin Amedî zaravê “kesî” bikarîname. (Amêdî, 1987, s. 224).

Nerîman Xoşnaw, zaravê “kesî” bikarîname. (Xoşnaw, 2012, s. 55).

Şerzat û Aras Monib, zaravê “kesî” bikarîname. (Sebrî & Aras Munîb, 2016, s. 278).

Lijneyek ji wezaretê Perwerdehiyê pola heftê bi nered, zaravê “kesî” bikarîname. (Lijneyek ji Wezaretê Perwerdehiyê, 2018, s. 87).

Remezani Zaxoyî, zaravê “kesîn” bikarîname. (Zaxoyî, 2009, s. 52).

Bavê Nazê, zaravê “kesî” bikarîname. (Bavê, 2012, s. 78).

Li goreyê van nivîseran Zaravê “Kesî” û zaravê “kesîn” ev her du destewajê yê heyî di şêwezarê behdini da lê wekî ye diyar cudahiya van herdu zaravan li ser astê dengî ye. Ê herdu curên zaravan heman mebest digehînin. Ku ew jî amaje ye bo mirovan cudahiya van dengan li dumahiya peyvê bo hinde vedigerît ku girêdayî derbirîneka kesî ye. Çi pêwendî bi layenên zanistî û rêzimanî ve nîn e.

4. 1. 2. Pênaseyên Cihênnavên Kesên Serbexo

Pênaseyên cihênnavên kesan yê serbixu zimanvanên kurd bi awayên cuda cuda cihênnavên kesan pênase kirine.

Nûrî Elî Emîn dibêjît: “Ew ranawanin ke Serbexo dihêne gotin. Ewîlîaxaftîne pê destpêkiriye.” (Emîn, 2013, s. 97). **Nerîman Xoşnaw** dibêjît, “cihênnavên kesî wateya kesê giyandar digirîte xwe. Ku ewîş kiseker, gogir û ne amadebûyî degirêtewe” (Xoşnaw, 2012, s. 55). **Xerîb Elî Salih** dibêjît, “cihênnavê kesî, ev bêjêne yê ku di pêvajoya hevokan da li dewsa navên kesan yan giyaneweran û tiştan tên. Ev kes jî ji kesê yekem duyem û sêyem” (Salih, 2017, s. 26). Dîsan **Ebdilvahit Muşîr Dizeyî** dibêjît “Ew morffîmana ke amaje bu kesan diken. Ê le birî kes becardên”. (Dizeyî E. M., 2014, s. 73). **Nezîr Ocek** dibêjît: “Cihênnavên kesan ew peyvînan ku di nava hevokê da cihê navdêr giyanewer û heyberan digirin. Sê ji wan yekjimar in sê ji

wan pirjimar in. Bi giştî şeş libin. ”(Ocek, 2018, s. 115). **Lijneyak ji wezaretaperwerdê**, “ew peyvên ku cuda dihêne gotin û nivîsîn, ramana kesekî ye yan çend kesan nişan dide. Û peywendiyên bi kesanên dî ve aşkere diken û ramana wan jî aşkera ye. Di axaftina nivîsînê da. Cihê kesê êkê, duyê, siye digirin. Bi tak û ko ve. ” (Lijneyek ji Wezaretaperwerdehiyê , 2018, s. 89).

Di pênaseya Nûrî Êlî da nivîserî hewl daye layenê serbixwuna peyvê diyar bike-tin. Ku ew jî li deme nevîsane. Li sere hevokê têt. Dîsa di pênaseya Nerîman daamaje daye du layenan. Ya yeke şirovekirina peyva kesî ye ûlayanê duyê amaje dete bikarhînana wan de. Ku ew jî axaftinker Guhdar ne amadebûyîne. Di pênaseya Xerib da ev tewere li dûr cihênnavî diyar kirine. Le demê ristê de ev peyve dişên li cihên navan bihên. Çi navê giyandaran bî yan cihan bî. Disan amaje daye wan kesên ku bo dihêne karînan. Ew jî kesên yekê, duhê ûsêyan in. Di pênaseya Mûşîr Dizayê, li astê rêzimana nî pênaseya cihênnavê kiriye. Çunkî zararvê morfîn bikar hînaye. Û dîsanlayanê birkarhanîna van payvan diyar kiriye. Ku ew jî kes in. Nezî Ocek, di pênaseya xwe de diyar diketin, hem jimara cihênnavên kesanehem cihêkarînan û diyarkirina wan ku ew jî hevok e. Em dişên bibêjinev pênase taradeyekî ji hemî wan pênaseyên me amaje pê kirî baştir e. Çunkî pitirî ya mebestên cihênnavên kesan, bu dihêne bikarhînan amajeya pêkiriye. Wekî serbixwe ya peyvê û di nivîsîn û gotinê daû nişandana wateyê daû peywendiyên wan bi kesan ve. Û hejmara kesan. Û diyarkirina jimara wana. Bi şeweyeke giştî, di van pênaseyên di serî da pitirîya nivîseran di du taweran da bûçunên wan wekî êk in. Ku ew jî babetê diyarkirina kesan e. û babetê hejmara wan kesane ku dihêne bikarhînatin.

Curên kesan dibine sê cur. Kesên axaftinker kesên guhdar kesên amade buyî. (Abdullah & Salih, 2010, s. 55).

Hejmara kesane jî du cur in. Tak (êkjimar) û ku (pirjimar)(Abdullah & Salih, 2010, s. 56).Hejmara kesan bo her sê curan dizivirin ku hem dibine tak hem jî dibine ku.

Wekî van nimûnan:

Ez kurê tank û topa **min** divê qîr û ceng

Ez kurê tîp û koma min divê nav û deng. (Cegerxwîn, 2011, s. 135).

Ez û min cihênavên kesa ne yên tak in. Bu axaftinkerî.

Numune:

Ew kesê pîs û nezan û reben

Nadem deste wî bihayê kefen(Cegerxwîn, Aştî, 2011, s. 62).

“**Ew**”û “**wî**”jî cihênavên kesêserbixwe û tak in. Bo ne amadebûyî.

Numune:

Ger bê **te** neminim**tu** ji bom in ji çirayî (Cegerxwên, 2011, s. 238).

“Te” û “tu” cihênavên serbixwe ne û kesên tak ên guhdar in.

Numune:

Medigirin bi zorê me dibin ji bo şer

Em hev du dukujin tev birçî tev tazî (Cegerxwîn, Serwa Azadiyê, 2011, s. 84).

“**Me**”û “**em**” cihênavên serbixwe, kesên yekemîn û kom in.

Numune:

Hewa bawer nekîr bi pêxemberê xwe

Ji weliya û şîretên wê quranê(Nalbent, 1998, s. 197).

Hewa cihênavê serbixwe, kesê duwemîn û kom in.

Numune:

Ser selîqeyê wanperen mîsalan

Seretacê ewanmelek xîsalan(Duskî, 2008, s. 83).

Wan û ewan cihênavên serbixwe ne. Kesên sêyemîn kom in.

4. 1. 3. Pêkhatina Cihênavên Kesê Serbexo

Wekî ya diyar cihênavêh kesa yên serbixwe di zimanê Kurdî da govera Behdînanji du komalan pêk dihên. Komala êkê dibêjinê komala “**min**”. Komala duyê dibêjine komala “**ez**”. (Yasîn, 2013, s. 68). Ew jî even e.

a. Komala Min

Xiştê 1: Cihênnavên Kesan Komala Min.

Kes	Tak (yekjimar)	Kom (Pirjimar)
Kesê êkê (Axaftinker)	Min	Me
Kesê duyê (Guhdar)	Te	Hewe
Kesê sêyê (Amade nebûyî)	Wî/ ewî Wê/ewê	Wan/Ewan

b. Komala Ez

Xiştê 2: Cihênnavên Kesan Komala Ez.

Kes	Tak (yekjimar)	Kom (Pirjimar)
Kesê êkê (Axaftinker)	Ez	em
Kesê duyê (Guhdar)	Tu	hun
Kesê sêyê (Amade nebûyî)	Ew	ew

Di diyalekta sere yê zimanê kurdî cihênnavên kesî yê Serbexo pêkhatine ji du komalan. Ew jî komala min û komala ez. Cihênnavên van komalan sade ne. Çunkî du şiyanda nîn e paşgir û pêşgiran wer bigrin. Lê ew morfîmên wateya ferhengiya peyvê naguhurin em naşên bêjînê peyvên dariştî yan lêkdayîne. (Zêrîn, 2012, s. 24).

Lê cihê têbiniyê ew e ku cihênnavên komala min “ewî” “ewê” û “ewan” ku ev cihênnavên ji du morfîman pêk hatine. Ew jî morfîma serbexu “ew” û morfîma du xêtiyan, “î”, û “ê” û morfîma “an” nişana komkirinê e. Her çendê morfîmên du xêtiyan morfîma komkirinê ye erkê rêzimanî dibinin. Û peyvên dariştî çênaken. Lê ji berku ew cihênave zaravên di rêzimanê da ku ser bi komala min ve ne. Lewra buye egerê hindê ew cihênave bibine peyvên ferhengî û pêk ve biçine di nav ferhengê da.

4. 2. Cihênnavên Xoyî Yê Serbexo

Dê van tewerên xarê da basê cihênnavên xoyîkên.

4. 2. 1. Zaravê Cihênavê Xoyî Yê Serbexo

Sebaret zaravê cihênavê “xoyî” li def ewan zimanvanên devera Behdînan yan ew kesên li ser rêzimana vê deverê kar kirî, du zarav bu cihênavî bi kar hînaye.

1. Xoyî

2. vegir

Bavê Nazê zaravê “xoyî” bikarînaye (Bavê, 2012, s. 91).

Maruf Xeznedar, zaravê “xoyî” bikarînaye (Xeznedar, Woşesazî Beşê Duyem Cihênav, 2014, s. 245).

Lijnek ji wezaretê zaravê “xoyî” bikarînaye (Lijneyek ji wezaretê perwendehiyê poha 11, 2017, s. 25).

Şêrzat Sebrî û Aras Munîb zaravê “xoyî” bikarînaye (Sebrî & Aras Munîb, 2016, s. 279).

Nerîman xoşnaw, zaravê “xoyî” bikarînaye (Xoşnaw, 2012, s. 68).

Sadiq Bahadîn Amedî zaravê “xoyî” bikarînaye (Amêdî, 1987, s. 247).

Nîjar Slêman, zaravê “xoyî” bikarînaye (Silêman, 2011, s. 8).

Îbrahim Remezani zaravê “vegir” bikarînaye. (Zaxoyî, 2009, s. 42).

Muwafîk Zibêr, zaravê “vegir” bikarînaye. (Yasîn, 2013, s. 38).

4. 2. 2. Pênaseyên Cihênavên Xoyî Yê Serbexo

Sadiq bahadîn Amedî dibêjîtin “ew cihênavê ku li cihê kesekê yan jî tiştekî bi kar bêt. Yan jî ji polê rukmandina navekê yan cihekî bi kar bêt”. (Amêdî, 1987, s. 247). **Nerîman Xoşnaw**, dibêjîtin “cureke lecurekanî cihênav le ruyî wata ke xaweniyetî xawendarî degeyenet”. (Xoşnaw, 2012, s. 67). **Bavê Nazê** dibêjîtin: “Di zimanê kurdî da cihênavê xoyî heye. Ê herdem şuna navî digire. ” (Bavê, 2012, s. 91). Lijneyek ji wezaretê perwerde dibêjîtin: “Cihênavê xoyî cihênavê digrît. Ê raman û wateya, çextkirinê tê da heye. Ê di du boranda dihête bikarhînan. ” (perwerdê, 2017, s. 30). **Nûrî Elî Emîn** dibêje: “ew ranawane ne kelebîrî kesê yan şitê ya bu tewkîdî nawê yan ranawekî tir bekar ehênrê. ” (Emîn, 2013, s. 104).

Li gorî van pênaseyên serî diyar dibêtin ku peyvek bi çend şeweyeka derbirîn ya hey yan dihête bikarhînan. Li cihê nawan yan yan cihênavên kesan. Lê di hindêk pênase-

seyan da amaje bo hinde jî kiriye cihênavê xoyî du rolan digerît.

1. Dihête bikarhînan weku cihênav. Wate cihênavî digre.

2. Dihête biharhînan wa ku çext kirin bu wî navî yan cihênavê li gel hatiye biharhînan.

Disa di van pênaseyan da diyar dibîtin ku di cihênavê xoyî da rêgez û hejmara kesan diyar nabîtin. Dîsan li govera Behdînan du forum bo cihênavê xoyî hene .ew jî “xo” û “xwe”.

Mînak:

Binêre em bi carek tev dibezin

Welatê xwe bi azadî dixwazin. (Cegerxwîn, Şerefnameya Mem û Zînê, 2011, s. 14).

“xwe” cihênavê xoyî yê serbexuye.

Bergên gulên reyhanî ye

Katub bi xwe xal daniye. (Duskî T. Î., 2011, s. 178).

“xwe” cihênavê xoyî yê Serbexo ye. Bo xuyetî hatiye bikarhînan.

Mînak:

Herkês bi qiyasê hîmmeta xwe

Dê serif biket iradeta xwe (Cihanê, 2013, s. 34).

Li vêrê jî xwe her du caran wekû cihênavê xweyê yê serbixwe hatiye bikarhînan.

4. 2. 3. Pêkhatina Cihênavên Xoyî Yê Serbexo

Di zimanê kurdî da govera Behdînan ev cihênavên xoyî bi sade ne. Ku pêkhata wan nayête guhurîn. Wekû cihênav. Lê ji layê peyvên ferhengî ve dihêta guhurîn. Bi şêweyekê giştî pêkhatina lêkdayî da cih digire. Wekî “xu malî, xwedanî, xwera-girî...td.” Lê ev peyvê nabine cihênav. Bi vê formê. Çunkî eger em sehkeyîne nav ferhengê da dê van peyvên bînî û mebest û wateya wan ya diyar e.

4. 3. Cihênavên Nişane Yê Serbexo

Ew tewerên lêkolînê bikin li ser cihênavên nişane yê Serbexo di zimanê kurdî da bi şêwezarê bahdînî ev in, ji layê zaravê ve û ji layê pênaseyan ve ji layê pêkhatinê ve.

4. 3. 1. Zaravê Cihênave Nişane Yê Serbexo

Sadiq Bahadîn Amedî zaravê “cihênave nişankirinê” bikarîname. (Amêdî, 1987, s. 237).

Şêrzat Sebrû û Aras Munîb zarvê “amaje” û “nişane” bikarîname. (Sebrî & Aras Munîb, 2016, s. 282).

Lijneyek ji Wezaretê perwerdehiyê zaravê “nişane” bikarîname. (Lijneyek ji Wezaretê Perwerdehiyê, 2018, s. 81).

Bavê Nazê zaravên “nişane” û “amaje” bikarîname. (Bavê, 2012, s. 86).

Remezani Zaxoyî zaravê “nişandanê” bikarîname. (Zaxoyî, 2009, s. 39).

Xoşnaw zaravê “nişane” bikarîname. (Bavê, 2012, s. 66).

Deham Ebdurehman, Zaravê “nişandanê” bikarîname. (Abdulfettah, 2006, s. 49).

Weku ya diyar li gorî van nivîseran hemî di êkgirtî nebûyine. Bo diyarkirina zaraveyê tune. Bo cihênave nişane. Raste hemî nivîseran amaje bi peyva “nişane” kiriye. Lê hindek nivîseran peyva amajeji bikarîname.

4. 3. 2. Pênaseyên Cihênave Nişane Yê Serbexo

Ebdulwehap Xalit, dibêjî, “Cihênave nişane du komal in. Komala yekê bo diyarkirina jimara û ya duyê durrî - nêzikî dihênebikarînan. (Xalit, 2009, s. 123). Nuri Êlî Emîn dibêjî: “ew cihênave cigê gele ewey ke cê nawê şitê egirên îşaretî şiyar pê ekirêt. Naweke, yan şite ke”. (Emîn, 2013, s. 106). Deham dibêjî, “Ew cihênave yan ku navên mirov giyanewer û tiştan destnişan dikin”. (Abdulfettah, 2006, s. 49). Nerîman xoşnaw dibêjî, “Bew cihênawane dewotrêt ke le ceynvi kesek yan şitêk da denirêt. Ew destnişanî deken.” (Xoşnaw, 2012, s. 66). Bavê Nazê dibêjî, “Di zimanê kurdî da cihênave nişane çawa kesan waha ji giyanewer û tiştan destnişan diken.” (Bavê, 2012, s. 86). Sadiq Bahadîn Amedî dibêjî, “ew cihênave yan cihênave digirin, Bi awayekî nişane kirinê.” (Amêdî, 1987, s. 137). Lijneyek ji wezaretê dibêjî: “cihênave nişane peyveke cihênave nêzikî digirî li şîna wi navî bikarîname destnişan diket.” (Perwerdehiyê, 2014, s. 84).

Wakû ya diyar di van pênaseyan da her êkê layekî babetî yan ji layekî pitir

cihênaven nişane amaji bo kiriye. Lê her hemî di van herdu xalan da diêkgirtîne.

1. Ku her hemîyan amaje bi hinde kiriye ku cihênnavên nişane li cihê navan digirin.

2. Dîsa her hemîyan amaje daye bi hindê ku cihênnavên nişane dişên navan destnişan jî bikin.

4. 3. 3. Pêkhatina Peyvên Cihênnavê Nişane Yê Serbexo

Li dîv rêzimana kevin û ew çavkanîyên li ber destê me yên li ser tayûra klasîk nivîsî çî ji wan nivîseran yan jî zimanzanan di pertûkên xwe de amaje ne daye bi vê babetê. Ev çende jî hindê digehînit ku cihênnavên nişane ji layê pêkhatinê va hemî bi sade ne. Çunki li gor pênaseyên peyvên darija û lêkdayê divêtin peyveka nî di ferhengê da zêde bikin. Raste hindek jî wan peyvan ji peyveka sade û paşgirekî yan pitir pêk hatiye. Wekî cihênnavê ewêhe ku bûnerê takê dûr hatiye bikarînan. Ku pêk dihêtin ji (ew+ê+he)

Ew/ cihênnavê kesê sê yêtak û ku ye.

ê/nişana nişê nêr e.

he/ paşgir e.

lê cipênave “ewêhe” hemî bi pêk vewekî formekî serbixwe bo cihê navê nişane hatiye bi lêv kirin.

Cihênnavên nişane jî evên di nava vî xiştê xwarê da ne.

Xiştê 3: Cihênavên Nîşane.

Mewda	jimare	regez	Cihênavên nişane
Nêzîk	Tak	X	Eve
		Nêr	Evî
		Mê	Evê
	Ku	X	Evan
Dûr	Tak	Nêr	Ewêhe
		Mê	Ewahe
	Ku	X	ewênhe

Numune:

Eve hat.

Evî nan xwar

Evê nan xwar

Evan nan xwar.

Ewêhe nan xwar

Ewahe nan xwar

Ewênhe nan xwar.

4. 4. Cihênavên Pirsiyarî Yê Serbexo

Dê van tewerên xwarê li ser cihênavên pirs lêkolîn bikin. Ji layê zaravê ve ji layê pênaseyan ve û ji layê pêkhatinê ve.

4. 4. 1. Zaravê Cihênavê Pirsiyari Yê Serbexo

Ev çavkaniyêd me di vekolîna xwe da bikarînayên nivîserê vanher hemiyani di pertûkên xwe da di êkgirtî buyîne derbareyê zaravê cihênavê pirsiyarî yê Serbexoji ber ku herhemiyani zaravê “pirs” bikarînaye.

Bavê nazê, zaravê “pirs”bikarînaye. (Bavê, 2012, s. 81).

Amêdî zaravê “pirs” bikarînaye. (Amêdî, 1987, s. 253).

Nerîman Xoşnaw zaravê “pirs”bikarînaye. (Xoşnaw, 2012, s. 84).

Kurdistan Mukrîyanî disa zaravê “**pirs**” bikarînaye. (Mukruyanî, 1980, s. 244).

4. 4. 2. Pênaseyên Cihênave Pirsiyari Yê Serbexo

Ezîz Samur dibêjît “cihênave pirsiyarî ew cure cihênave ku di hevokên pirsan da cihê navan digirin. (Samûr, 2014, s. 200). Bavê Nazê dibêjît, “di zimanê kurdî da çend cure cihênave pirsiyarî hene. Û di rista pirsiyarîyê da cihê xwe digirin.” (Bavê, 2012, s. 81). Nerîman Şoşnaw dibêjît, “bew cihênawane Dewtrê ke pirsiyar le kesek yan şitêk yan katêk yaxut rudawek deken.” (Xoşnaw, 2012, s. 74). Sadiq Bahaddîn Amedî dibêjît “cihênave pirsiyarî ew cihênave yê ku cihê navan bi awayekî pirsiyarî digirin.” (Amêdî, 1987, s. 253). Lijneyek ji wezaretê perwerdehiyê dibêjît “Ew peyvên ku li cihê navê kesekî yan tiştekî di şeweyê pirskirinê da bi kar dihên û Erkê navê lê hatiye pirsiyar kirin. Di vê riste de dibînin”. (Lijneyek ji Wezaretê Perwerdehiyê, 2014, s. 89). Nurî Elî Emîn dibêjît “Ew ranawane ke cîge lewey pirsiyariyan pê ekrê beşewên şarekanê şiyane egirene.” (Emîn, 2013, s. 110). Kurdistan mukriyanî dibêjît “Mebest le cihênave pirsiyarî ew cihênawanin ke le riste da pirsiyar le kes û şit û rudaw deken.” (Mukruyanî, 1980, s. 244).

Eger em bi hişiyarî van pênaseyên nivîserên liserî diyarkirî bixwînin dê bo me diyar bît ku di nav pênaseyên wan de b cihênave pirs ku hemî di van duxalan da di hevpişkin. Derbareyê pênasekirina cihênave pirsiyarî.

1. Ku hindek peyvên heyî di zimanê kurdî da bu mebesta pirsiyar kirine. Û hindek ji wan peyvên dibine cihênave. Ku dibêjinê cihênave pirs.

2. Ku hir peyvek ji wan peyvên pirsiyarî bo mebesteka pirsiyarî ya diyarkirî dihête bikarînan. Wekî bo navê kesane peyveka pirsiyarî heye. Bo pirsiyarkirina tiştan peyveka pirsiyarî heye. td.

4. 4. 3. Pêkhatina Peyvên Cihênave Pirsiyari Yê Serbexo

Cihênave pirsiyarî ji layê pêkhatinê ve hemî di sade ne. Ku dîsa çî zimanvanên kurd amaje bi vî tewerê nekiriye. Heta ku di pertîkên dibistanan da jî amaje pê nekirine. Lê Muwafaq Zibêr di lêkolîna xo ye masterê da ewa bi navê “cihênave di navbera zimanê kurdî û Erebi da” (Yasîn, 2013, s. 70).. Amaje bi ne sadeyi ya du

cihênavên pirsiyarî kiriye. Ew jî kîjik û kîjan. Ku evên he nabine ne sade çunkî morffimên rêzimanî wergirtîne. Morffimên rêzimanî erkê rêzimanî diyar diket. Nek wata ferhengî dugurît.

Cihênavên pirsiyarî jî evên xwarê ne.

1. “kî” û “kê” pirsiyar pê li kesekî dihête kirin. Wekî

Kî zîrek e.

2. “Çî” Pirsiyar pê li tiştêkî dihête kirin. Wekî:

Çî dêhêt.

3. “Kîj û kîşik” pirsiyar û distn”îşankirina tiştêkî dêhête kirin. Wekî:

Kîjik ji wan şikest? Kîjqutabî hat?

4. 5. Cihênavên Ne Diyar Yê Serbexo

Dê van tewerên xwarê li ser cihênavên nediyar lêkolîn bikin. Ji layê zaravê ve ji layê pênaseyan ve û ji layê pêkhatinê ve.

4. 5. 1. Zaravê Cihênavê Nediyar Yê Serbexo

Îbrahim Remezani zaravê “**nediyar**” bikarîname. (Zaxoyî, 2009, s. 56).

Şêrzad Sebrî û Aras Munîb zaravê “**nediyar**” bikarîname. (Sebrî & Aras Munîb, 2016, s. 281).

Sadiq Bahedîn Amedî varavê “**nediyar**” bikarîname. (Amêdî, 1987, s. 263).

Lijneyek ji wezaretê Perwerdehiyê pola 10ê zaravê “**nediyar**” bikarîname. (Lijneyek ji Wezaretê Perwerde, 2017, s. 59).

Nerîman Xoşnaw, zaravê “**nediyar**” bikarîname. (Xoşnaw, 2012, s. 73).

Mwefeq Zibêr zaravê “**nediyar**” bikarîname. (Yasîn, 2013, s. 83).

Wekû ya diyar di nav van nivîserên li serî me amaje pê kirî ku nivîserên wan hemîyan êk zarav bikar ne îname. Ji ber hindê di êkgirtî nebûyîne di diyar kirina zaravê cihênavên ne diyar da.

4. 5. 2. Pênaseyên Cihênavê Nediyar Yê Serbexo

Nurî Elî Emîn dibêjt “Ew ranawanin Muayenî cêy kesê yan şitê nagirin.” (Emîn, 2013, s. 112).

Nezîr Ocek dibêjît “ew peyvin ku nediyareyeka kîjan navdêrê nîşande yan amaje dike bi tenê ew navderan bi şêweyekî sergirtî amaje diket”. (Ocek, 2018, s. 141).

Sadiq Bahedin Amêdî dibêjît, “ Ew chpênavane yê ku cihê kesekî yan tiştêkî xwa malî nagirineve” (Amêdî, 1987, s. 263).

Lijneyek ji Wezaretê perwerdehiyê pola 10ê dibêjît, “Cihênave nediyar ew peyve ku li cihê navê miraovekî yan giyanewerekî yan her tiştêkî dî bihête bikarînan. Ku ew nav bi eşkirayî diyar nîn e kanê kî ye?” (Wezaret, 2017:60). Nerîman Xoşnaw dibêjît “Aw cihê nawane de girêewe kelebîrî nawî kesê yan giyandarêk yan her şitekî tir be kar dehênrêt. Belam em nawe be aşkirayî û diyar niye. Ke kî ye û çiyê?” (Xoşnaw, 2012, s. 73). Şêrzat Sebrî û Aras Munîb dibêjin: “ew cure peyve ya li cihê naveki, yan cihê navekî di risteyê da dihêt. Ê bi şêweyekî nediyar û ne aşkera cihê ewê navî digirît. Ê her bi serbixoyî berçav dibit. ” (Sebrî & Aras Munîb, 2016, s. 281).

Di van pênasayên serî da bome diyar dibêt ku ew peyvên em dibêjinê cihênave nediyar ew peyvin ku ramana wanbo hinde ye deme em bikar dihînin li cihê navekî ew nav neyête nasin. Ka kî ye yançi ye?).

4. 5. 3. Pêkhatina Peyvên Cihênave Nediyar Yê Serbexo

Li dîf wan pertûkên li ber destê me yan ew çavkaniyên me din lêkolîna xwe da bi karhînaye bi tenê sê nivîsera amaje daye bi babetê pêkhatina van curên cihênavan. Ku ew jî SadiqBahedîn amêdî ye ku dabeşî sê curan kirine. Sade, dariştî û lêkdayî. (Amêdî, 1987, s. 263).

Disan Nerîman Xoşnaw ku wî jî heman bûçuna Amêdî heye (Xoşnaw, 2012, s. 76).

Her wasa Mwefeq Zibêr pêkhata cihênavên nediyar kiriye du beş. Ku ew jî sade û nesade ne. (Yasîn, 2013, s. 71).

Sebaret curên van cihênavan dîsan çî ji wan nivîserên me di nav lêkolîna xwe de bi kar înan hejmarê van cihênavan diyar nekiriye di nav pertûkên xwe da. Wate her hemiyana nişana bedewamiyê bikarînaye. Ku ewjî eve ye. (... . htd.) lewma em jî

neşên hejmara wan diyar bikin.

Bi tenê dê wan diyarken ewên berbelav di nav axaftinê da ew jî eve ne.

(filan, kabira, bêvan, kes, hindek, kême gelek, piçek, êk, xir, hemî, tişt, ... htd.)

4. 6. Cihênave Lêkder Yê serbexo

Dê van tewerên xwarê li ser cihênave lêkder lêkolîn bikin. Ji layê zaravê ve ji layê pênasayan ve û ji layê pêkhatinê ve.

4. 6. 1. Zaravê Cihênave Serbexo Yê Lêkder

Îbrahîm Remezani Zaxoyî zaravê “geyner” bikarîname. (Zaxoyî Î. R., 2008, s. 53).

Sadiq bahedîn Amêdî, zaravên “geyner, pêgeh” bikarîname. (Amêdî, 1987, s. 250).

Şêzad û Aras, Zaravê “lêkder” bikarîname. (Sebrî & Aras Munîb, 2016, s. 284).

Lijneyek ji wezaretê Perwerde, zaravê “lêkder” bikarîname. (Lijneyek ji Wezaretê Perwerde, 2017, s. 17).

Disan nivîserên devera Behdînan yan ew nivîserên amaje daye bi zarê vê deverê di êkgirtî nebûyîne. Derbarê zaravê cihênave lêkder. Ji ber ku ji zaravê pitir berçav dibin nav çavkaniyên wan da.

4. 6. 2. Pênasayan Cihênave Serbexo Yê Lêkder

Deham Ebdulfetih dibêjît “ew cihênave yê ku di rêxistina hevokê da peyvên pêşî xo bi yê paşiyê xwe ve gire dide”. (Abdulfetih, 2006, s. 72). Şêzad Sebrî û Aras Munîb dibêjin “Ew cure cihênave ye yê li cihê naveke di la risteyê da digirît. Di beşe pariste da gelek caran cihênave heyî jî di gel da dihêt”. (Sebrî & Aras Munîb, 2016, s. 284). Sadiq Bahedîn Amêdî dibêjît “ ew cihênave yê ku peywendiyê û hevaliya kesekê yan tiştekê di hevokê da bipêşiya wî ve bi bestît. An ko du hevokan pêk ve gire didet. Ê cihê navî bigirît. Xasime heke li pêşya hatîte gotin. ” (Amêdî, 1987, s. 250). Nurfî Elî Emîn dibêjît “ Ew ranawanin ke du riste be yekewe ebestin. Ê hem cêgayê nawêkîj egerin. Le parçe şewên kewtu daye. Be mercê navekem le pêşewe

bêjrabê. ” (Emîn, 2013, s. 108).

Lijnek ji wezareta perwerdê dibêjît “ew peyve ku li cihê navê kesekê yan tişteke dihête bikarînan. Ku pêştir yê hatiye baskirin her wisa du risteyan pêk ve girêdidet. Û risteyeka lêkdayî pêkdiînin. ” (Ljneyek ji Wezareta Perwerde, 2017, s. 21).

Eger biwirdî li van pênasan binihêrî dêbînîku her êkê bi şeweyekî cuda cihênave lêkder yê serbixu pênasê kiriye. Lê her hemî amaje dene bi wê çendê ku cihênave lêkder divêt du riste pêkve bihêne girêdan. Nav di her du risteyan da hebît. Û her du êk nav bin. Demê hr du riste dibine risteyeka lêkdayî û lu cihênave rista du yê cihênavekê lêkder bikartînin. Wekî:

Mamosta xemxur e.

Mamosta Erkê xo cih be cih diket.

Mamosta, ku Erkê xo cih be cih diket xem xur e.

4. 6. 3. Pêkhatina Peyvên Cihênave Lêkder Yê Serbexo

Weku ya diyar ku cihênave lêkderê serbixu li govera Behdînan êk cihênave bi tenê ye. Ew jî “ku” ye û peyveka sade ye. Ne dişêt pêşygirî yan paşygirî werbigrît. Lewma nabîte peyveka dariştî yan ya lêkdayî.

Mînak:

Azad xoştivî ye.

Azad karê xo bi durustî diket.

Azad, ku karê xo bi durustî diket, xoştivî ye.

4. 7. Cihênave Heyî Yê Serbexo

Dê van tewerên xwarê li ser cihênave heyî lêkolîn bikin. Ji layê zaravê ve ji layê pênaseyan ve û ji layê pêkhatinê ve.

4. 7. 1. Zaravê Cihênave Serbexo Yê heyî

Sebare zaravê cihênave heyî yê serbexu ew pertûkên li ber destê me yan ew pertûkên wekî çavkanî me di nav vê lêkolînê da bikar înay3Î her hemiyên êk zarav bi kar îna ye bo vî cihênave. Kuew jî zaravê “heyî” ye.

Şêzad û Aras, zaravê “**heyî**” “bikarînaye (Sebrî & Aras Munîb, 2016, s. 283).

Lijnek ji wezaretê pola 11ê zaravê “heyî” bikarîname(Ljneyek ji Wezaretê Perwerde, 2017, s. 38).

Sadiq Bahedîn Amêdî zaravê “heyî” bikarîname(Amêdî, 1987, s. 232).

4. 7. 2. Pênaseyên Cihênave Heyî Yê Serbexo

Şêzad Sebrî û Aras Munîb dibêjin “ew cure cihênaveye ku ji bo temellik û xuyetiye bikar têt.” (Sebrî & Aras Munîb, 2016, s. 283). Lijnek ji wezaretê dibêjt “ Ew cihênave ku bo xudaniye dihete karinan. Ê çêdibit xudanê wê nav yan cihênave bit û di risteye da erkê wî navî werdigrît. Ku cihê wî digrît. Ê di hindek risteyan da amrazê peywendî li pêşiyê dihêt. Erkê timamkerê beyarîde werdigrît”. (Ljneyek ji wezaretê perwendehiyê poha 11, 2017, s. 38). Sadiq Bahedîn Amêdî dibêjt “ Ew cihênave ye ku hevaliniya mirovan û caneweran û tiştan bi kesekê yan pitir diyar bike cihê wî jî bigre”. (Amêdî, 1987, s. 232). Nûrî Elî Emîn dibêjt, “ Ew ranawe ye ke şitê eka behî kesek û hem cêgey şitekeş egre.”(Emîn, 2013, s. 114). Nerîman Xşnaw dibêjt, “ cihênave heyîcureke le curekanê cihênaw. Le royî watawe kewataye xewandariyê degeyîni. Xawenekeşî deşê nawbî yan cihênaw bit. Ê lenêw riste da erkê naveke yan cihênaweke. Pê despêdirê”. (Xoşnaw, 2012, s. 70).

Ev cure cihênave jî wekî cihênaven dî yê serbixoyê her zimanzanekî bi awayekê daye niyasîn. Wate li grî xandina me bo van pênasan ev zimanzane di êkgirtî nebûyîne. Ku her hemî liser pênaseyekî rêkeftibin. Wekî ya diyar di nava van pênaseyan da hindeka bes amaje daye bi rolê hebûna vî cihênave di risteye da. Wekî pênaseya Şêzad Aras Munîb û hindeka amaje daye bi erkê cihênave di risteye da. Wekî li pênaseya lijna wezaretê. û hindek nivîsera amaje daye bo wateya wê bi erkê wê. Wekî pênaseya Nerîman Xoşnaw. Lê eger mirov bihêrî li cihênave heyî binhêrît dê zanîn ku van pênaseyan hindek kêmasî tê da hene. Yanî em dişên bejin ku ev pênase ç idi giştîgîr nînin.

4. 7. 3. Pêkhatina Peyvên Cihênave Serbexo Yê heyî

Weke ya diyar di zimanê kurdî da devera Behdînan cihênave heyî bes pîta “î” ye. Ê paşê amrazên nîfî yan rîgezî, ya dane pale bu takên nîr ku ew jî pîta “ê” ye. Ê bo takê mê ew jî pîta “a” ye. Ê bi kuyê mê û nêrew jî “yên” e. lê dihêne zêdekirin. Ê

pitiriya zimanzana wan amrazên regezî yê danepalê kirine pişkek yan beşek ji cihênavê heyî ku ew jî dibine “ya” û “yê” û “yên” e. (Sebrî & Aras Munîb, 2016, s. 283).

Wate cihênavê heyî bes “sade”ye. Nabîte dariştî û lêkdayê.

5. ERKÊN CIHÊNAVÊN SERBEXO

Di pênaseyên cihênavên Serbexo da bo me wise diyar buye. “ Cihênavên Serbexo cihê navan digirin. Û erkê wan yê rêzimaê di risteyan da werdigire”. (Silêman, 2011, s. 11). Wate ew peyva li vihê navandigirin. Divêt hemî wan erk û taybetmendiyê navî werbigirin. Disa divêt cihênav van erkan werbigirin.

1. Nihat (kirdeya tebatî)
2. Biker (kirdeya lebatî)
3. Berkar (bireser)
4. Berkarên ne rastexo (bireser)
5. Diyarkerên navî
6. Temamkerêkarên bêhêz
7. Cihêgirê biker

5.1. Erkên Cihênavên Kesên Serbexo

5. 1. 1. Nihad (Kirde Tebatî)

Numune:

Ezê şareza me.

Ez cihênavê kesê Serbexo ye. Bo kesê êkê tak e.

5. 1. 2. Biker (Kirdeya Lebatî)

Numune:

Em serkeft in.

Em cihênavê kesê Serbexo ye. Bo kesê êkê ku ye.

5. 1. 3. Berkar (Bireser)

Numune:

Mamosta dê min xelat ket.

Min cihênavê kesê Serbexo ye. Bo kesê êkê tak e.

5. 1. 4. Berkarên ne Rastexo (Bireser)

Numune:

Ev deme yê ji min diçît.

Min cihênavê kesê Serbexo ye. Bo kesê êkê tak e.

5. 1. 5. Diyarkerên Navî

Numune:

Mamosta yê min hat.

Min cihênavê kesê Serbexo ye. Bo kesê êkê tak e.

5. 1. 6. Temamkerê Karên Bêhêz

Numune:

Ew warê min e.

Min cihênavê kesê Serbexo ye. Bo kesê êkê tak e.

5. 1. 7. Cihêgirê Biker

Numune:

Ez hatime xelat kirin.

Ez, cihênavê kesê Serbexo ye. Bo kesê yekê tak e.

5. 2. Cihênavên Xoyî Yê Serbexo

5. 2. 1. Nihad (Kirde Tebatî)

Cihênavên xoyî yên Serbexo di zimanê kurdî bi şêwezarê behdinî da nabine nîhad.

5. 2. 2. Biker (Kirdeya Lebatî)

Cihênavên xoyî yên Serbexo di zimanê kurdî bi şêwezarê behdinî da nabine biker.

5. 2. 3. Berkar (Bireser)

Numune:

Mamostayê xo binyase.

Xo cihênavê kesê Serbexo ye.

5. 2. 4. Berkarên Ne Rastexo (Bireser)

Numune:

Ez bi xo serkeft im.

Xo cihênavê kesê Serbexo ye.

5. 2. 5. Diyarkerên Navî

Numune:

Azad keça xo hinarte zanko yê.

Xo cihênavê kesê Serbexo ye.

5. 2. 6. Temamkerê Karên Bêhêz

Cihênavên xoyî yên Serbexo di zimanê kurdî bi şêwezarê behdinî da nabine biker.

5. 2. 7. Cihêgirê Biker

Numune:

Ez bi xo hatime girtin.

Xo cihênavê kesê Serbexo ye.

5. 3. Cihênavên Nişane Yê Serbexo

5. 3. 1. Nihad (Kirde Tebatî)

Numune:

Eve şareza ne.

Eve cihênavê nişane ye. Bo nêr û mê û nêzîk û tak e.

5. 3. 2. Biker (Kirdeya Lebatî)

Numune:

Eve çû zanko yê.

Eve cihênavê nişane ye. Bo nêr û mê û nêzîk û tak e.

5. 3. 3. Berkar (Bireser)

Numune:

Min evêdît.

Eve cihênavê nişane ye. Bo nêr û mê û nêzîk û tak e.

5. 3. 4. Berkarên Ne Rastexo (Bireser)

Numune:

Bom in jî eve hat.

Eve cihênavê nişane ye. Bo nêr û mê û nêzîk û tak e.

5. 3. 5. Diyarkerên Navî

Numune:

Kurê evî endezyar e.

Evî cihênavê nişane ye. Bo nêrê nêzîkê tak e.

5. 3. 6. Temamkerê Karên Bêhêz

Numune:

Ew warê evîye.

Evî cihênavê nişane ye. Bo nêrê nêzîkê tak e.

5. 3. 7. Cihêgirê Biker

Numune:

Eve hate xelat kirin.

Eve cihênavê nişane ye. Bo nêr û mê û nêzîk û tak e.

5. 4. Cihênavên Pirsiyarî Yê Serbexo

5. 4. 1. Nihad (Kirde Tebatî)

Numune:

Kî yê zîrek e. .

Kî cihênavê pirsiyarî yê Serbexo ye. Bo kesan.

5. 4. 2. Biker (Kirdeya Lebatî)

Numune:

Kê ya nameya min xwand.

Kê cihênavê pirsiyarî yê Serbexo ye. Bo kesan.

5. 4. 3. Berkar (Bireser)

Numune:

Mamostayê kê hat?

Kê cihênavê pirsiyarî yê Serbexo ye. Bo kesan.

5. 4. 4. Berkarên Ne Rastexo (Bireser)

Numune:

Te bo kê xwand?

Kê cihênavê pirsiyarî yê Serbexo ye. Bo kesan.

5. 4. 5. Diyarkerên Navî

Numune:

Xîndkarê kê bi serkeft?

Kê cihênavê pirsiyarî yê Serbexo ye. Bo kesan.

5. 4. 6. Temamkerê Karên Bêhêz

Numune:

Evekî ye?

Kî cihênavê pirsiyarî yê Serbexo ye. Bo kesan.

5. 4. 7. Cihêgirê Biker

Numune:

Kî hate azad kirin?

Kî cihênavê pirsiyarî yê Serbexo ye. Bo kesan.

5. 5. Cihênavên Ne Diyar Yê Serbexo

5. 5. 1. Nihad (Kirde Tebatî)

Numune:

Kabira şareza ye?

Kabira cihênavê nediyar e.

5. 5. 2. Biker (Kirdeya Lebatî)

Numune:

Kabira hat.

Kabira cihênavê nediyar e.

5. 5. 3. Berkar (Bireser)

Numune:

Min kabira xelat kir.

Kabira cihênavê nediyar e.

5. 5. 4. Berkarên Ne Rastexo (Bireser)

Numune:

Mamosta ji kabirayê wergirt.

Kabira cihênavê nediyar e.

5. 5. 5. Diyarkerên Navî

Numune:

Mala kabirayê xirabû.

Kabira cihênavê nediyar e.

5. 5. 6. Temamkerê Karên Bêhêz

Numune:

Eve ew **kabra** ye.

Kabira cihênavê nediyar e.

5. 5. 7. Cihêgirê Biker

Numune:

Kabira hatie xelat kirin.

Kabira cihênavê nediyar e.

5. 6. Cihênavên Lêkder Yê Serbexo

Ew çavkaniyên li ber destê me û ewên me bi kar înyê di nav vekolîna xo da çî ji wan nivîseran amaje nedaye bi erkên cihênavên lêkdayî. Bi tenê di nav nama mastera “Mwefeq Zibêr”da amaje daye bi hindê ku cihênavê lêkdayî ne cihênav e.(Yasîn, 2013, s. 45). Belku nivîser evî cihênavî bi amrazên (daçek) lêkder binav kirine.

5. 7. Cihênavên Heyî Yê serbexo

Ew çavkaniyên li ber destê me û ewên me bi kar înyê dinav vekolîna xo da çî ji wan nivîseran amaje nedaye bi erkên cihênavên heyî. Bi tenê di nav nama mastera “Mwefeq Zibêr”da amaje daye bi hindê ku cihênavê heyî ne cihênav e. (Yasîn, 2013, s. 45).Belku nivîser vî cure cihênavî bi nişanên nîşî binav kirine.

BEŞA DUYEM

1.ÇEMKÊ CİHÊNAVÊ SERBEXO DÎ ZİMANÊ TİRKÎ DE

(TÜRK DİLİNDE ZAMİRLER ÜZERİNE GENEL BİR İNCELEME)

Çemkê cihênavên serbixwe mirov dişêt bi çar aliyan va bi nirxîne. Ji layê mêjuyê veû ji layê zaravê ve ji layê watayê veû ji layê pênaseyan ve.

1.1. Ji Layê Mêjûyê ve (Tarihi Açıdan Zamirler)

Bo zimanê tirkî jî ya durust nabî kueger em bejin mêjuya peyva cihênav dizivirîte ve bo sala 1530 e ku êkem kes behsa rêzimana tirkî kirî ji layê Bergamalî Kadriewa di nav pertûka Meyseret u el ulum (Purde, 2016). Çunkî her jî êkem pêngava lêkolinkirinêli ser zimanî hatiye kirin ew jî dabeşkirinapolen axafnitê buye. Li çerxê pêncê û şeşberî zayîne li ser deste ziman nivîsê saniskîrdî buye. Lê bu cara yekem peyva cihênav wakû beşekî serekî yê axaftinê hatiye bikarînan dizivirîte ve bo zimanvan (Traks)î. Vi zimanvanî beşên axaftinê kirine heşt mijar. Êk ji wan cura cihênav bûn. (Sebrî & Aras Munîb, 2016, s. 9).

Yaxelet nabît eger em vê mêjû ya traks bikar bînin. Bo zimanê Tirkî jî. Çunkî hindek yasayên zimanî yan mêjuyê zimanvaniyê ya girêdayî si zimanekî tenê ve nîn e. Ji ber ku hindek vekolîn derbirînêji zimanekî tenê naken. Belku bi zimanan bi giştî diket. Lewma ew beşên axaftinêTraks diyarkirî bi kar înayî zimanvanên Tirk jî he-man cur bikar inayne li nav zimanê tirkî da. Ku wan jî beşên axaftinê kirine heşt cur. Ku dîsan êk ji curên wî yê serekî cihênav in(Bonguoğlu, 2015, s. 152).

1.2. Ji Layê Zaravê ve (Terim Olarak Zamirler)

Ömer Yılmaz, zaravên “kelime olarak”“adıl û zamir” bikaraînaye (Yılmaz, 2008, s. 171).

Zeynep Korkmaz, zaravê “kelime olarak”“zamir” bikar înaye(Korkmaz, 2003, s. 399).

Burhan paçaioğlu zaravê “kelime olarak”“zamir” bikar înaye(Paçayioğlu,

1987, s. 85).

Muhittin Bilgin, zaravê “Adıl” bikar îname (Bilgin, 2002, s. 246).

Ew kesên ku lêkolîn li ser zimanên Tirkî kirin di êk girtî nebûyine di helbijartina zaravê cihênavan da. Çunkî hemî li ser êk zaravîtenê rêk nekeftîne bo karanîna zaravê cihênavê. Lewma dibinin dinav pertûkên wan da du zarav hatine bikaranîn. Êk ji wan peyva ‘zamîr’ e. Ku ji zimanê Erebi hatiye wergirtin. Û peyva du yê ya zaravê cihênavê ji peyveka zimanê tirkî ye ew jî peyva ‘adıl’ e.

Helbet hem ji layê bikaranîna serekî hem jî ji layê bikaranîna mêjuyî ve. Zaravê zamir hem ji layê mêjuyî ve kevintir e. Hem jî ji layê bikaranîne ve pitir hatiye bi kar hanîn. Ji zaravê adıl. Dibêt eger bi kar inana peyva adil bo hindê bizivirêkt ku peyva zamir peyvaka biyanî ye. Lewma zimanvanên tirk hewl daye li cihê peyva zamirpeyveka tirkî bikar bînin.

Lê hebûna bikarhanîna çend zaravekan bo babetekî têxindevanê tûşî aloziyê diketin bo fêrbûna wan. Lewma dibinindi pertûkên qutapxaneyan da yên waneya zimanê tirkî bi her du zaravan li ser hatiye nivîsîn (Ergin, 2016, s. 283).

1.3. Ji Layê Wateyê ve (Anlam Açısından Zamirler)

Ji aliye wateyê va dema ku mirov cihênavan bi tenê binirxîne dibine kû tu wateyên wan nîn in. Cihênava di nava hevokê de dema ku bibin nûnerê navan wê deme wateya navan tînin ziman. Her çiqas şûna wan bîn bikaranîn jî nikarin bibin pênuş, av an jî ax.

Bikevin şûna kîjan navî dikarin di şûna wan de bîn bikaranîn. Wekî hunermendê şanoyê mirov dikare rola kesekî/ê wergire lê nikare bibe heman kes. Cihênava dikare bibe nûnerê navê lê nikare şûna navê bigire (Ergin, 2016, s. 284).

Ji ber ku dema mirov peyvapênûş, dar, av bikar tînin bi tenê wêneyên van ke-risteyan di nav mêşkê mirovî de peyda dikin. Lê belê dema mirov peyva ‘ben’, ‘sen’, ‘ne’, ‘bu’, ‘o’ derdibirîtin bi tenê ne çî wateyekî digihînin ne jî çî wêneyan di nav hizrên me dapeyda diketin.

1.4. Ji Layê Pênaseyê ve (Tanımlar)

Ev pênaseyên ji layê zimanvanên Tirk ve bo Cihênavan hatiye kirin pitiriyê wan

boçonê wan nêzikî êk in. Hindek ji wan even e:

Gurhan Ulukan dibêjît, “Ji hine peyv û qertafên ku di hevokê de şûna navan digirin re tê gotin cihênav. Hine Peyv an jî hine qertafên ku ji bo demeke kurt şûna navan digirin û şûna navan dikarin benê bikaranîn, cihênav in.” (Ulukan, 2018, s. 1). **Harun Ardiç dibêjît**, “Peyvên ku bixwo ne nav in, lê dikarin şûna navan bêne bikaranîn ji wan peyvan û qertafan re têgotin cihênav. ” (Ardiç). **Zeynep Korkmaz dibêjît**, “Cihênav morfîmeke rêzimanê ye ku tiştan û kesan nîşan didin û şûna wan tenê bikarhanîn”(Korkmaz, 2003, s. 399). **Burhan Paçaioglu dibêjît**, “Nav, hevalnav û hevalkar dikarin tiştên heyî bi tenê serê xwe bînin ziman lê cihênav nikarin bi tenê serê xwe tiştên heyî bînin ziman. Qelem û al dikarin qelemê û alê bînin ziman, . Ev peyv bêyî nîşandan dişên van tiştan pêşwazî bikin. Lê peyva ‘ev’ê nikare bêyî nîşandayin tişteki bîne ziman” (Paçaioglu, 1987, s. 81). **Şahap Bulak dibêjît**, “Peyva cihênavê di ferhenga de bi wateya 1. hestên navîn, 2. dil û vîjdan, 3. Tiştên veşartî yê di dil de, 4. peyvên ku di ristê de cihen navan digirin hatiya pênasekirin(Devellioğlu, 1996:1167)”(Bulak, 2016, s. 33).

Ji van pênaseyan bo me diyar dibêtin di zimanê Tirkî da cihênav bes peywendiyabi navî va heye. Wate çî di axaftina asayî da bîtin yan pirsiyarî bîtin, yan nediyar bîtin ... td. Wekî Gürkan Ulukan amaje kiriye jimara wan cihênavan di astê demê bikarînanan wan da. Disan Harûn amaje kiriye layenê wateyî yê cihênavan ku ne peyvên ferhengî ne lê dişên cihê peyvên ferhengî bigirin. Disan Zeynebê amaje kiriye bi rolê wan ên rêzimanî. Burhan Paçaioglu amaje kiriye bi cihêwaziya curên peyvan digel cihênavan.

2. TAYBETMENDIYÊN CIHÊNAVÊN SERBEXO DÎ ZIMANÊ TÏRKÎ DE

(TÏRK DİLİNDE BAĞIMSIZ ZAMİRLERİN ÖZELLİKLERİ)

1. Binyatê wan ji nava ne. Lê di hebûna xwe da di sînardar in. Wate jimara wan ya diyarkiriye.

2. Cihê navekî yan cihê navekî pitir digirin. Hem bo naskirina navan jî têne bikaranîn.

3. Girîngiya diyarkirina wana di erkî da pitire ji layenê wan yê wateyî ve.

4. Bo demekê kêma cihê navî digirin.

5. Di wergirtina paşgirên rîzimanî da heman şîyanên navan hene. Wate ew paşgirên nav wer digirin cihênava jî dişên wer bigirin. Lê belê di warê dariştina peyvê da yan pêkhata peyvê da heman şîyan nîn in.

6. Di pêkhatiya xwe de hem dişên tak bête bikarhînatin hem dişên bi şewê kom bihêne bikarhanîn.

7. Dişêtin di nav ristê da li cihê navî bigrît bêyî çî kar tê kirin li wateya ristê bibîtin.

8. Di nav risteyan da bi tena sere xwe dişêta erka werbigrît.

9. Hindek hevalnav dişên wekî cihê navî bene bikaranîn.

10. Hemî ziman dişên navan ji zimanekî dî werbigirin di nav zimanê xwe de bikar bînin. Lê çîz imana naşên cihênava ji zimanekî dî bînin di nav zimanê xwe de bikar bînin. (Ulukan, 2018, s. 1).

3. POLÊNKIRINA CİHÊNAVÊN SERBEXO Dİ ZİMANÊ TÏRKÎ DE

(TURK DİLİNDE (BAĞIMSIZ ZAMİRLERİN SINIFLANDIRILMASI))

Navlêkirin diyarkirina curên cihênava cûda li dev zimanzan û di nav pertûkên zimanî û rîzimanî Tirkî da bi vî awayî ne.

1. “**Zeynep Korkmaz**, Türkiye Türkçesi grameri (Şekil Bilgisi). ”(Korkmaz, 2003, s. 504)Bi vî awayî navên wanû curên wan diyarkirine.

A. Cihênava kesana (Şahıs zamirleri)

B. Cihênava vegerok (Dönüşlülük zamirleri)(Tan, 2005, s. 115).

C. Cihênava Nîşane (İşaret zamirleri)

D. Cihênava nediyar (Belirsizlik zamirleri)

E. Cihênava pirsiyarî (Soru zamirleri)

2. “(GABAIN, 2013, s. 61-131).Bi vî awayî navên wanû curên wan diyarkirine.

A. Cihênavên kesan(Şahıs zamiri)

B. Cihênavên Nîşane (İşaret zamirleri)

3. “**Muharrem Ergîn** Universiteler İçin Turk Dili. ” (Ergin, 2016, s. 284) Bi vî awayî navên wanû curên wan diyarkirine.

A. Cihênavên kesan (Şahıs zamirleri)

B. Cihênavên Nîşane (İşaret zamirleri)

C. Cihênavên pirsiyarî (Soru zamirleri)

D. Cihênavên nediyar (Belirsizlik zamirleri)

4. “**Kerim Demirci** zamirler (dilbilimsel bir yaklaşım Bi vî awayî navên wanû curên wan diyarkirine. ”(Demirci, 2014, s. 42).

A. Cihênavên kesan (Şahıs zamirleri)

B. Cihênavê veğerok (Dönüşluluk zamirleri)

C. Cihênavên berbihevîn (Karşılıklılık zamiri)

D. Cihênavên Nîşane (İşaret zamirleri)

E. Cihênavên nediyar (Belirsizlik zamirleri)

F. Cihênavên pirsiyarî (Soru zamirleri)

5. **Tahir Nejat Gencan**(Gencan 1971: 214-228)(Demirci, 2014, s. 42).Bi vî awayî navên wanû curên wan diyarkirine.

A. Cihênavên kesan(Kişi adılları)

B. Cihênavên Nîşane (İm adılları)

C. Cihênavên nediyar (Belgisiz adıllar)

D. Cihênavên pirsiyarî(Soru adılları)

6. “**Jean Deny** Türkçe Dil bilgisi” (Demirci, 2014, s. 42). Bi vî awayî navên wanû curên wan diyarkirine.

A. Cihênavên kesan (Kişi zamirleri)

B. Cihênavên Nîşane (İşaret zamirleri)

C. Cihênavên nediyar (Belirsizlik zamirleri)

7. “**Tahsin Bongoğlu** Turkçenin Grameri”(Bongoğlu, 2015, s. 357). Bi vî awayî navên wanû curên wan diyarkirine.

- A. Cihênavên kesan (Şahis zamirleri)
- B. Cihênavên Nîşane (Gösterme zamirleri)
- C. Cihênavên vegerok (Dönuşluluk zamirleri)
- D. Cihênavên pirsiyarî (Soru zamirleri)
- E. Cihênavên nediyar (Belirsizlik zamirleri)

Dinav van partûk û nivîseran da bo me diyar dibêtin ku hemîyan bi awayekê wekhev behsê cur û navlêkirinên wan wekî êk nînin. Hindek nivîseran ji layê curan ve ji hindekên din cuda ne. Dîsan hindek ji wan ji layê navlêkirinê va ji hev cuda ne. Ev çende aloziyan li dev xwandevevananpeyda dibe. Bê guman ev çende jî dibête egerê peydakirina aloziyê li dev xwandevevanan

4. CÛRÊN CİHÊNAVÊN SERBEXO DÎ ZİMANÊ TÎRKÎ DE (TURK DİLİNDE BAĞIMSIZ ZAMİRLERİN ÇEŞİTLERİ)

Di zimanê tirkî da ew cihênavên hatine bikaranîndi nav pertûkên dibistanan da derbirinê ji zimanê fermî yê tirkîtiyê dikan. Pênc cureyên cihênavên cuda (kelime olarak) hene. Ew jî ev in(Ulukan, 2018, s. 173)

- 1. Cihênavên kesan (Şahis zamirleri)
- 2. Cihênavên xoyî (Dönuşluluk Zamirleri)
- 3. Cihênavên Pirsiyarî (Soru Zamirleri)
- 4. Cihênavên nişane (İşaret Zamirleri)
- 5. Cihênavên nediyar (Belgisiz Zamirler)

4.1. Cihênavên Kesên Serbexo Di Zimanê Tirkî De (Turk Dilinde Debağimsız Şahıs Zamirleri)

Ev tewerên li xwarê bi şêweyekê hur dê vekolînê li ser biken. Ew jî ji layê zaravê va ji layê bûcûnên zimanzan ên tirk ve ji layê pêkhatina peyvê ve

4. 1. Cihênavên Kesan (Şahıs Zamirleri)

Ev tewerên li xwarê bi şêweyekê hur dê vekolînê li ser biken. Ew jî ji layê zaravê va û ji layê bûcûnên zimanzan ên tirk ve ji layê pêkhatina peyvê ve.

4. 1. 1. Ji Layê Zaravî ve (Terim Olarak Kişi Zamirleri)

Yıldız Kocasavaş zaravê “**şahıs zamirleri**” bikar îname (Kocasavaş, 2004, s. 30).

Tahir Nejat Gencanzaravê “**Kişi adıları**” bikar îname (Gencan, 1971, s. 228).

Tahsin Bongoğluzaravê “**şahıs zamirleri**” bikar îname (Bongoğlu, 2015, s. 357).

Ömer Yılmaz, zaravên “**Kişi û şahıs adılı**” bikar îname (Yılmaz, 2008, s. 171).

Muhittin Bilgin, zaravê “**kişi Adıları**” bikar îname (Bilgin, 2002, s. 248).

Di zimanê tirkî de ji layê zaravî va hemû zumanzanan yek zarav ji bo cihênavên kesên serbexu bikar nehname. Ji bo cihênavên kesan hindek dibêjinê (Şahıs Zamirleri), hindek dibêjinê (Kişi zamirleri), hindek jî dibêjinê (kişi adıları). Hebûna çendîn zarava aloziyê li def xwendevanan peyda diket.

4.1.2. Ji Layên Pênaseyan ve (Tanım Açısından Kişi Zamirleri)

Cihênavên kesa yên serbixwe (şahıs zamirlerinin) ji layê çendîn zimanvanên Tirk ve hatine pênasekirin.

Muharrem Ergin dibêjît, “Cihênav peyvên ku hemû hebûnan wekî kesayeti pêşwazî dikin û nûnertiya wan dikin in.” (Ergin, Türk Dilbilgisi, 1993, s. 251).

Harun Ardiç dibêjît “Peyvên ku navên mirovan wekî kesan digirin cihênav in.” (Ardiç). **Gökhan Ulukan** “Cihênav peyvên ku di şûna navên kesan tên bikananîn

in. ”(Ulukan, 2018, s. 1). **Kerim Demirci** “Cihênavên kesan ew peyvin yê li cihê navên murovan tene bikarhînan. ”(Demirci, 2014, s. 42)**Muhittin Bilgin dibêjt,** “Pêyvên ku kesan pêşwazî dikin û wekî navên mirovan tene bikaranîn têgotin cihênavên kesan. ”(Bilgin, 2002, s. 252).**Yaşar Akdoğan dibêjt,** “Hemû hebûn di sê kesan de kom dibin. Sê kesan tînin holê. Axaftinker, Guhdar kesên ku navê wan derbast dibin. ”(Akdoğan, 2000, s. 87). Li goreyê van pênaseyên serî bo me diyar dibîtin ku cihênav li şuna navan dihêne bikarhînan. Wa k udi pênaseya Muharrem Ergîn ûdu mijarên dî d vanpênayenayan da diyar dibin. Mijara yeke sê cureyên kesan ji bo me diyar diketin. Ê ya duyê hejmara kesan diyar diketin. Ew jî di pênaseya Yaşar Akdoğan da diyar dibîtin.

4.1.3. Ji Layên Pêkhatinê va (Yapıları Bakımından Dönüştürülme Zamirleri)

Di zimanê tirkî da pêkhatina cihênavên kesên serbexu sê curan bi xwe va digirin Ew jî evene.

Sade (Basît), **dariştî** (Turemiş), **lêkdayî** (Birleşik). (Korkmaz, 2003, s. 404).

4.1.3.1. Sade (Basît)

(Basit (Yalın) Zamirler). Cihênavên ku paşgir* digel nebin dibine cihênavên serbexu yê sade. (Ardıç, s. 5).

Xiştê 4: Cihênavên Kesên.

Kes (Kîşî)	Tak (yekjimar) (Teklik)	Kom (Pirjimar) (Çokluk)
Kesê êkê (Axaftinker) (Birinci Şahıs Konuşan)	Ben	Biz
Kesê duyê (Guhdar) (İkinci şahıs dinleyen)	sen	Siz
Kesê sêyê (Amade nebûyî) (Üçüncü Şahıs Orda olmayan)	O	Onlar

4.1.3.2. Dariştî (Turemîş)

Cihênavên Serbexo yê dariştîew cihênavên yê ku pêk têt ji cihênavêke sade digel paşgirek yan pitir û wateyeka nî didin. (Ulukan, 2018, s. 8).

Numune: (Bana, beni, benimki, senden, onlarınkiler... td.)

(Bana) pêkhatiye ji cihênavên serbexuyên sade. (Ben) û ji paşgirê (-a) ku wateya peyva ben hatiye guhurîn wateyaka nî didetin.

4.1.3.3. Lêkdayî (Birleşik)

Cihênavê Serbexo yê lêkdayî ew cihênavên yan ku pêk dihên ji du cihênavên Serbexo yêd sade yan cihênavêke sade digel cihênavêke serbexu yê dariştî, yan du cihênavê Serbexo yên dariştî pêk dihêtin û wateyaka nî didin. (Korkmaz, 2003, s. 404).

Numune:(Ben sen, biz siz, onlar bunlar ... td.)

Cihênavên serbexu yê lêkdayî (Ben sen) pêkhatiye. Ji du cihênavên sade yê serbexu.

4.2. Cihênavên xoyî Yên Serbexo Di Zimanê Tirkîde

(Turk Dilinde Bağımsız Dönüşlülük Zamirleri)

Ev tewerên li xwarê bi şeweyekê hur dê vekolînê li ser biken. ew jî ji layê zaravê va ji layê pênaseyan ve û ji layê pêkhatina peyvê ve

4.2.1. Ji Layê Zaravê ve (Terim Olarak Dönüşlülük Zamirleri)

Ew çavkaniyên bi zimanê tirkî me di nav vekolîna xwe da bikar înayin û ewên li berdestê me hemî di êkgirtî bûyine derbareyî helbijartin zaravên cihênavêxoyî da. Ku her hemiyan zaravê “**dönüşlülük**”bikarînaye.

4.2.2. Pênaseyên Cihênavên Serbexo Yê Xoyî

(Turk Dilinde Dönüşlülük Zamirleri Hakkında Yapılan Bazı Tanımlar)

Zeynep Korkmaz dibêjît, “Cihênavên xoyî ji cihênavên kesan bihêztirin. Ji layê helgirtina wateyê ve” (Korkmaz, 2003, s. 414). ji aliye wateyê ve cureyekî cihênavên kesanin ku wan piştras dikin. **Muharrem Ergindibêjît**, “Cihênavên xoyî bi şekle peyva “**kendi**” wate “xwe” ye ku bi şekle xwedîtiyê çêdibîtin” (Ergin, Üniversiteler İçin Türk Dili , 2016, s. 266). **Mustafa Altun dibêjît**, “Ew cihênavêye ku karên dihêne kirin li bikerî dizivîrînin û nişan didet, an jî di nava gotinê dakesên ku dihêne pêş nişan dike dibêjine wan cihênavê xoyî” (Altun, s. 10). **Muhîttin Bilgin dibêjît**, “Cihênavên xoyî bi peyva “kendi” pêkhanîna girêdana kesî xurt diketin”(Bilgin, 2002, s. 252). **Tahsin Boguoğlu dibêjît**, “Kiryarên ku li bikerî vedigerin û nişan diden bikerî pitir berçav diketin dibêjinê cihênavê xoyî”(Boguoğlu, 2015, s. 364). **Ömer Yılmaz dibêjît**, “Peyva xoyî (Kendi) ku dibêjinê cihênavê xoyî di heman deme de wekî cihênavê kesan in”(Yılmaz, 2008, s. 192). **Özgür Ay dibêjît**, “Di zimanê nivîsînê yê Tirkî da ji cihênavê wekî “Xwe” (kendi) tê bikaranîn cihênavê xoyî ye”(Ay, s. 18). **Burhanpaçaoğlu dibêjît**, “Ev Cihênavên xweyi ji layê xwedaniya vateyê ve gelek bihêztirin ji cihênavên kesan”(Paçayioğlu, 1987, s. 83).

Di nav van pênaseyên zimanvanên Tirk da ev ên li serî diyarkirî bo min diyar dibît ku cihênavên xoyî (dönüşlülük Zamiri) ne wekû cinênavên kesên serbexo ne. Di nav pênaseyên cihênavên kesan dadu mijar bo me diyar kiribû. Ku me bi zelalî

diyar kiriye. Ev çendê jî bo hinde dizivîrît ku hejmara peyvên cihênavên kesên serbexu ji çendîn peyvan pêk dihên. Wekî (Ben, sen, o, ... td.) Lê cihênavên xoyîyên serbexu ji yek peyvê bi tenê pê dihet. Ew jî peyva (kendi) ye. Ê bi harîkariya çendin curên paşgiran ew herdu mijarêndi nav cihênavênkesan yên serbixwe di nav cihênavênxwoyî yê serbixwe peyda dibin.

4.2.3. Ji Layê Pêkhatinê va (Yapıları Bakımından Dönüştürülme Zamirleri)

Di zimanê tirkî da pêkhatina cihênavên xoyî serbexu sê curan bi xwe va digirin Ew jî evene.

Sade (Yalın), **dariştî** (Turemiş), **lêkdayî** (Birleşik).

4.2.3.1. Sade (Basit)

(Basit (Yalın) Zamirler). Cihênavên ku paşgir* digel nebin dibine cihênavên serbexu yên sade.

Numune: (kendi)

4.2.3.2. Dariştî (Turemiş)

Cihênavên xoyî yên Serbexo yê dariştî ew cihênavên yê ku pêk têt ji cihênavêke sade digel paşgirek yan pitir û wateyeka nî didin.

Numune: (kendime) ev peyva pêkhatiye ji peyva (kendi)+(me) ku di encam da buye peyveke dariştî ew jî peyva (kendime).

(kendimi) kendi+mi

(kendiminki) kendi+min+ki,

(kendimden)Kendi+m+den

4.2.3.3. Lêkdayî (Birleşik)

Cihênavê Serbexo yê xoyî yê lêkdayî ew cihênavê yê ku pêk dihên ji du cihênavên Serbexo yêd sade yan cihênavêke sade digel cihênavêke serbexu yê dariştî, yan du cihênavê Serbexo yên dariştî pêk dihêtin û wateyeka nî didin.

Numune: (kendi kendi) Ev peyva ya pêkhatî ji du cihênavên sade yêd serbixwe ew jî ji peyva (kendi + kendi) pêk hatiye.

(Kendi kendim) Ev peyva ya pêkhatî ji cihênavêke sade serbixwe û ji peyveka

cihênavê Serbexo yê dariştî (kendi + kendi+m) pêk hatiye.

(kendisi kendisine) ev peyva ji du peyvên dariştî yê Serbexo (Kendi+si Kendi+si+ne) pêkhatiye.

4.3. Cihênavên Nişane Yên Serbexo

(Turk Dilinde Bağımsız İşaret Zamirleri)

Ev tewerên li xwarê bi şêweyekê hur dê vekolînê li ser biken. Ew jî ji layê zaravê va ji layê pênasayan ve û ji layê pêkhatina peyvê ve.

4.3.1. Ji Layê Zaravê ve Cihênavên Nişane

(Terim Olarak İşaret Zamirleri)

Muhittin Bilgin zaravê “**gösterme**” bikar înatin. (Bilgin, 2002, s. 254).

Ömer Yılmaz, zaravê “**gösterme (İşaret)**” bikar înatin. (Yılmaz, 2008, s. 171).

Harun Ardıç zaravê “**işaret**” bikar înatin. (Ardıç).

Ayşegül (Seyman)koç, zaravê “**gösterme**” bikar înatin. (Koç, 2006, s. 50).

Dîsan cihênavê nişaneyê yê serbexu di zimanê tirkî da wekî cihênavên kesan, cihênavên yên kesan, ewî jî du zarav bo hatine bikarînan. Hindek zimanzan dibêjine (gösterme zamirleri), hindek dibêjine (İşaret zamirleri) lê weku ya diyar ku peyva (gösterme) peyveka tirkî ye lê li gorî mêjuya wan çavkaniyên li ber destê me peyva (işaret) kevintir e ji layê bikaranînê ve ji peyva (gösterme). Û peyva (işaret) di binyada payveka Erebi ye.

4.3.2. Ji Layê Pênaseyan ve Cihênavên Nişane

(Tanım Açısından İşaret Zamirleri)

Ev pênaseyên xwerê diyarkirî bîr û bûcûnên çendîn zimanvanên tirkin derbareyê cihênavên nişane.

Zeynep Korkmaz dibêjît, “Ew peyva hebûn berçavkirin û beranberkirinê destnîşan diket dibêjinê cihênavên nişane” (Korkmaz, 2003, s. 420). **Muharrem Ergin dibêjît**, “Ew peyvên yên berhevi pêşwazî û nişandan û amaje û diyarkirina tiştan diken dibêjinê cihênavên nişane” (Ergin, Üniversiteler İçin Türk Dili , 2016, s. 251).

Mustafa Altun dibêjît, “Cihênavên nişane bi şêweyeke giştî navên tiştan nabêjîtin bi tenê amaje bi wandiketin û diyar diketin” (Altun, s. 10). **Tahsin Bongoğlu dibêjît**, “Ew tiştên ku di nav cihekî diyarkirî, demekê diyarkirî, di nav hizrê mirovan da amaje pê têtê kirin dibêjine wan peyvên cihênavên nişan e. Wekî (bu), (şu), (o). Hebûna vana bi sê astan diyar dibe. Nêzîk, piçek dûr û pir dûr” (Bongoğlu, 2015, s. 360). **Muhittin Bilgin dibêjît**, “Ew peyvên li şûna hebûn û amaje pêkirinê bi kar tên dibêjinê cihênavên nişane” (Bilgin, 2002, s. 254). **Harun Ardiç dibêjît**, “Li şûna cihên navê bi rêka nîşandanê amaje pê diket wekî peyvên (bu, şu, o, bunlar, şunlar, onlar, öteki, beriki, diğeri) dibine cihênavên nişane” (Ardiç, s. 3). **Kerim Demirci dibêjît**, “Ew peyvên rêya berçavkirinê û amajekirina tiştên bercişte û watayî diyar dikin dibêjine wan cihênavên nişane” (Demirci, 2014)(Demirci, 2014:54).

Li goreyî pênaseyên serî pitirîya wan bûçûna wan wekhev in. Lê ji van zanayên zimanî bi tenê “Tahsîn Bongoğlu” amaje daye astên curên cihênavên nişane yên zimanê tirkî ew jî diyarkirina cihê dûratiya wan tiştan e. Ku ew jî dibine sê cur. Nêzîk, dûr û dûrtir.

Cihênavên nişane Peyva ‘bu’ ji bo amaje kirina navekî yan keresteyeki kit yê nêzîk.

Mînak: Bu geliyor, ötekini bilmem.

Di vê ristê da cihênavê ‘bu’ ku navekî nêzîk nişan didet

Cihênavên nişane Peyva ‘şu’ ji bo amaje kirina navekî yan keresteyeki kit yê dûr.

Mînak: Şu beni görüyor.

Di vê ristê da cihênavê ‘şu’ ku navekî dûr nişan didet

Cihênavên nişane Peyva ‘o’ ji bo amaje kirina navekî yan keresteyeki kit yê dûrtir.

Mînak: O onlara baktı.

Di vê ristê da cihênavê ‘o’ ku navekî dûrtir nişan didet

Cihênavên nişane Peyva ‘bunlar’ ji bo amaje kirina navekî yan keresteyeki kom yê nêzîk.

Mînak: Bunlar geliyor, ötekileri bilmem.

Di vê ristê da cihênavê ‘bunlar’ ku navên nêzîk nişan didet
Cihênavên nişane Peyva ‘şunlar’ ji bo amaje kirina navekî yan keresteyeki kom
yê dûr.

Mînak: Şunlar beni görüyor.

Di vê ristê da cihênavê ‘şunlar’ ku navên dûr nişan didet
Cihênavên nişane Peyva ‘onlar’ ji bo amaje kirina navekî yan keresteyeki kom
yê durtir.

Mînak: Onlar balık tutuyor.

Di vê ristê da cihênavê ‘onlar’ ku navên durtir nişan didet.

4.3.3. Ji Layê Pêkhatinê ve Cihênavên Nişane

(Yapısal Açıdan İşaret Zamirleri)

Di zimanê tirkî da pêkhatina cihênavên nişane serbexu sê curan bi xwe va digirin
Ew jî eve ne.

Sade (Yalın), **dariştî** (Turemiş), **lêkdayî** (Birleşik).

4.3.3.1. Sade (Basît)

Cihênavên ku paşgir* digel nebin dibine cihênavên nişane yên serbexu yên sade.

Numune: ‘bu’, ‘şu’, ‘o’. ^{1*}

¹ * Pêdivîye ku di nav ristê da peyva ‘O’ be raçevkirinê. Lewra ‘bikaranîna peyva ‘O’ dibe ku di hevokê da bi erka cihênavên kesayetî û nişane û hevalnava nişane bigrît.

Mînak:

O yine gelmedi.

*Cinava kesayetî ji ber ku li dîv cihênavê serbexû O çi navek nehatiye lewma dibîte cihênavê kesan.
Çünkü eger em cihênavê o raken û navê kesekî li cihê wî daynin çi kar tê kirin li risteyê nabîtin.*

O daha uygundu.

*Cinava Nişaneji ber ku ev cihênav dikare tenê derbirînamirovan neke derbirîna daran beran an jî
giyanewerên din jî bikecihênavê işarkî ye.*

O ev daha genişti.

*Hevalnava nişane, li vê derê digel cihênavê nişane navek jî heye. Wê demê êdî mirov neşet derbirîna
cihênavê bike. ‘O’ li vê derê navekî nişan dike. Lewma ev peyv êdî cihênav nîn e. Erka hevalnavê
girtiye. Hevalnav e.*

Di nav mînaka êkê û duyê da peyva ‘O’ bi erke çênavê kesî û nişane girtiye û mînaka
dawiyê da jî peyva ‘O’ cihe hevalnava nişane girtiye.

Xiştê 5: Cihênavên Nîşane.

Tak (teklik)			ku (çokluk)		
nêzîk (yakın)	piçek dîr (az uzak)	dîr (uzak)	nêzîk (yakın)	piçek dîr (az uzak)	dîr (uzak)
Bu	şu	o	bunlar	şunlar	onlar

4. 2. 3. 2. Dariştî (Turemiş)

Cihênavên nîşane yên Serbexo yê dariştî ew cihênavên ku pêk têt ji cihênaveke sade digel paşgirek yan pitir û wateyeka nî didin.

Numune: ‘Buna’ ev peyva pêkhatiye ji peyva ‘bu’ + ‘na’ ku di encam da buye peyveke dariştî ew jî peyva ‘buna’.

‘Buna’ ‘bu’+ ‘na’

4.3.3.3. Lêkdayî (Birleşik)

Cihênavê Serbexo yê nîşane yê lêkdayî ew cihênava yen ku pêk dihên ji du cihênavên Serbexo yêd sade yan cihênaveke sade digel cihênveke serbexu yê dariştî, yan du cihênavê Serbexo yên dariştî pêk dihêtin û wateyeka nî didin.

Numune: ‘bu şu’ Ev peyva ya pêkhatî ji du cihênavên sade yêd serbixwe ew jî ji peyva ‘bu+şu’ pêk hatiye.

‘Bunları şunları’ ev peyva ji du peyvên dariştî yê Serbexo ‘Bu+n+lar+ı +şu+n+lar+ı’ pêkhatiye.

4.4. Cihênavên Pirsiyarî Yên Serbexo

(Türk Dilinde Soru Zamirleri)

Mijara zaravê cihênavên pirsiyari yên serbexu û pênaseyên cihênavên pirsiyarî yên Serbexo û pêkhata peyva cihênavên pirsiyariyê serbexu.

4.4.1. Ji Layê Zaravî vecihênavên Pirsiyarî

(Terim Olarak Soru Zamiri)

Di hemû wan çavkaniyên li ber destê me da heyîn Hem yên dibistanan û hem yên nivîskaran li derbareyê ziman û gramera tirkî yek zarav bi tenê hatiye bikarînan.

Bo çihênnavên pirsiyarî ew jî zaravê ‘soru zamiri’ye.

4.4.2. Ji Layê Pênaseyê ve Cihênnavê Pirsiyarî

(Tanım Olarak Soru Zamirleri)

Ev pênaseyên li xwarê ji layê zimanvanên Tirk ve hatine kirin bo Cihênnavê serbexu yê pirsiyarî di zimanê tirkî da hatiye kirin lê pitiriyaya wan boçûnê wan nêzîkî êk in. Hindek ji wan even e:

Mustafa Altun dibêjît, “Ev cure cihênnav ji layê pirsê ve şuna navan digirin”(Altun, s. 10). **Muharrem Ergin dibêjît**, “Ev cihênave, bi rêka pirsiyaran dibine nûnerê hebûna. Ê hebûnan nişan dikin. Wana wekî pirsiyar derbirînê jê dikin” (Ergin, Türk Dilbilgisi, 1993, s. 263). **Tahsin Bongoğlu dibêjît**, “Ew cihênnavên ku cihê navan digirin, bi rêka pirsiyaran nuneratiya navan dikin re têgotin cihênnavên pirsiyarî” (pronom interrogatif) (Bongoğlu, 2015, s. 364). **Ömer yılmaz dibêjît**, “Ew Peyva di nav ristê da pirsiyarê i navî diket dibêjinê cihênnavên pirs” (Yılmaz, 2008, s. 185). **Zeynep Korkmaz dibêjît**, “Cihênnavên pirsiyarî di pirsiyarê da nuneratiya tiştên bi giyan û bê giyan diketin” (Korkmaz, 2003, s. 441). **Kerim Demirci dibêjît**, “Chênnavên pirsiyarî li cihên tiştan û têgehan bi rêka bi rêka peyva pirsiyarî nuneratiya wan diketin” (Demirci, 2014, s. 61). **Muhittin Bilgin dibêjît**, “Ew peyvên pirsiyarî di risteyê da li cihê navî dihên dibêjinê cihênnavên pirsiyarî” (Bilgin, 2002, s. 258).

Li dî boçûna van nivîsarên zimanê tirkî her êkê bi şêwazekî derbirîn li êk tiştî kiriye. Ku ew jî ew e di nav rista pirsiyarî da pirsiyar li navê kesekî yan tiştêkî kiriye. Wekî pênaseya “Mustafa Altun û Muharrem Ergin û Tahsin Bongoğlu jî. Wate eger em vê pirsiyarî bersiv bidin li cihê peyva pirsiyarî divêt navek bê. Çi ew nav navê kesan bit yan cihênnavê kesan bit yan navê tiştêkî bit. Di nav zimanê tirkî da du cihênnavên pirsiyariyên serbexu yên serekî hene. Ew jî ew jî peyvên ‘Kim’, ‘Ne’ (Akdoğan, 2000, s. 66). ne. Lê dîsan bi harîkariya zêdekirina hindek paşgiran li ser hindek hevalnavan peyvên cihênnavê serbexu yên pirsiyarî durust dibin. Ew jî peyvên ‘Kaç’, ‘Hangi’ (Demirci, 2014, s. 61) ne.

